## Deng didin pîrepayîzokan!

Heke xwe ji stêra gelawêjê aciz kir, xemên zom û zozanan girt, bêhêvîtiya evîniyê anî ziman û di dawiyê de jî lê zêde kir û got, ez pîr bûm, ev dilkê lalik pîr nabe; ev payîzok e. Dema mirov guhdariya bendên payîzokan dike... ***Kenan Colemêrgî / R.5***



## Vayê Biden ê Amerîka do kêy bireso Kurdistan?

Hameyişê Bidenî taybetî ma Kurdan rê çi bîyaro? Enka mijara ma ya sereke ena ya. Trump şî, ma yew nefeso rehet girot la enkara pey do se bibo? Cewabê eno pirsî kampanyaya Biden ê limita de yo. Kampanya Weçîni-tişî de Biden eşkera... ***Mahîr Uzmez / R.9***




# xwebûn

16-22 MIJDAR 2020 HEJMAR: 48 BUHA: 4 TL rojname@xwebun.org


# Bi kaosê kêmasiyan vedişêrin

Li başûrê Kurdistanê talûkeya şerê navxweyî yê navbera hêzên kurdan didome û têkildarî mijarê rojnamegerê başûrî Şaswar Mame ji rojnameya me re axivî û destnîşan kir ku Başûr ji aliyê siyasî, leşkerî, çandî û gelek aliyên din ve ketiye bin kontrola dewleta tirk û dagirkeriya herî mezin ev bixwe ye. Mame aşkera kir ku ev demek e dirêj e bi sedema polîtîkayên PDK'ê Başûr di qeyraneké de ye û bi şer û kaosê kêmasiyên xwe vedişêrin û wiha got: “Dixwaze atmosfera şer ava bike û berê civaka Başûr ji van qeyranên navxweyî dûr bixe. Yanî şer rewa dike.” ***R.6***

## Birakujî tenê birayan nakuje

Munewer Azîzoglu Bazan / R.2



### *28 salan dîl hat girtin lê dev ji xeyalên azadiyê berneda*

*Li gorî daneyên Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) li girtîgehan 604 girtiyên bi nexweşiya giran, bi giştî hezar û 605 girtiyên nexweş hene. Girtiyê nexweş Sitki Berktaş, bêyî ji mafê xwe yê xatirxwestina ji malbatê sûdê bigire li girtîgeha Edirneyê jiyana xwe ji dest da. Berktaş ê 28 salan girtî ma, hat diyarkirin ku tenê xeyalek wî hebû. Ew jî vegere ser axa xwe bû...* ***R.3***

## Femîsîda li ser jinên Rojava

25'ê Mijdarê Roja Têkoşîna li dijî Tundiya li Jinan a Cîhanê nêz dibe û li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dê çalakî di çarçoveya hemleya 'Na ji qirkirin û dagirkeriyê re, em bi hev re jin û jiyanê biparêzin' de pêk bên. Femîsîd çi ye? Dema ku jin ji ber tundiya mêran jiyana xwe ji dest bidin, ev yek dikare wek femîsîdê bê pênasekirin. Femîsîd, sûcekî nefretê ye ku ji bo ravekirina vê yekê tê bikaranîn; ji embriyoyê heta cenînê, ji pitikatiyê heta zarokatiyê û kaltiyê, hemû ferdên xwedî zayenda jin, tenê ji ber zayenda xwe yan jî bi hinceta têgihana nasnameya zayenda civakî, ji hêla mêrekî ve yan jî bi motîvasyona mêrekî bê kuştin an jî ji bo ku xwe bikuje, zor lê were kirin. Femîsîd ango kuştina jinan, demek dirêj ji bo tunekirina civakan, komên etnîkî yan civakan taktîkeke... ***Cîhan Bilgîn / R.2***

## Li pêşiya me tofan heye!

Di 1598'an de Con O'Neillê welatparêz ku hemû jiyana wî bi têkoşîna li dijî kolonyalîzma îngilîzan derbas bûbû, di ber sikratê de van şîretan li kurê xwe dike: "Eger zarokên min fêrî îngilîzî bibin, genim bajon an li Ulsterê xanî çêbikin, ez ê heqê xwe li wan helal nekim. Dema bi vî zimanî biaxivin, wê serê wan tevlihev bibe. Dema genim bajon wê bêtir ji eslê xwe dûr bikevin û dema xanî çêbikin, ew ê di mala xwe de wekî xelkê bi îngilîzî diaxive, bijîn. Bi vî awayî, ew ê bibin sebeb ku hêlîna wan ji aliyê bazekî ve bê hilweşandin."... ***Necat Ayaz / R.8***

## Pîrê ma Seyît Riza

Şarê kurdî tarix ra heta roza ewroyîne zilmêdo pîl amo têrî. Zilmoke şarê kurdî dîyo na dîna ser o beno ke jû şarê bînî nêdîyo. Rûmetêci her tim bîyo hedefê quwetanê kolonyalistan û paştîdayoxanê înan.Terteleyê Dersîm kî nînan rayew o. No tertele zerîya şarê kurdî de hona jûdirvet o. Bi hazaran însonîpîl, qiz ameyî kistene. Bi hazaran surgunê sûkanê asîmîlasyon bî. Seyîdo Kal, Seyît Riza, lazê xo û hevalê ci ke Xarpêt de pêguretîyaye bî. Emrê Seyît Rizayî kerd qijkek, yê lazê ci Rezik Wûşenî kî kerd girs... ***R.9***

## Milkê kurdan e bi xêr û ber e

Te dît dinya ye. Rojekê derfeta we çêbû û we xwest li welatê xwe yê şîrîn bigerin. Teqez bila sewta strana Seîd Axayê Cizîrî ya "ew milkê kurdan te bi xêr û ber e/hemî mahden e, tev zîv û zêr e/..." ji teyiba erebeya we kêm nebe. Em jî wer dikin; dengê awaza Seîd Axayê Cizîrî, ji hoperlorê tomofîla me berz dibe û rê ji ber me diqelişe!... Vê carê em li ser şopa lanên hesin, yên Xaltî-Ûrartûya ne; lanên hesin yên li derdora Xarpêt û Dêrsimê. Ne îşê heneka ye! Cara ewil pêşiyên me yên xaltî, hesin di vê axê de kişif kirine... ***Agît Yazar / R.12***

# Me li çokên xwe nexist û negot em ê çawa bikin?



Şanoger Yavûz Akkuzu ji rojnameya me re axivî û anî ziman ku li dijî astengiyan xebatên xwe didomînin û wiha got: “Dema tiştek tê serê kurdan zû bi zû dikarin bi ser hev ve bînin; di pratîka kurdan de ev tişt tim wisa çêbûye. Mesela şer û qedexekirin çêbûne lê bi awayekî civiyane, organîze kirine û alternatîf afirandine. Me jî got em nikarin wisa di mala xwe de bisekinin û bi vî awayî amadekariya projeya ‘Hinek Henek’ê dest pê kir.”... ***R.4***

## NA'yê berhemên Sohrap çap kirin

Weşanxaneya NA'yê heşt berhemên hostayê helbesta Îranê Sohrab Sepehrî bi hev re çap kirin û pêşkêşî xwendevanên kurd kir. Sohrap Sepehrî, helbestvan, nivîskar û wênesazekî îranî ye. Sepehrî yek ji serkêşê helbesta nûjen a Îranê ye û helbestên wî îngilîzî, fransî, spanî û îtalî jî di nav de bi gelek zimanan hatine wergerandin... ***R.11***

## Wezîrê darayî ji kîsê çapemeniya alîgir çû

Piştî krîza aborî li Tirkiyeyê wezîrê darayî û xezîneyê Berat Albayrak ji peywirê hat girtin û li şûna wî Lutfî Elvan hat peywirdarkirin. Albayrak biryara xwe ya îstîfayê bi rêya medyaya civakî ragihand. Li gel ku ev îstifa ji hêla Albayrak bixwe ve hat ragihandin û dinya alem pê hesiya jî çapemeniya alîgirê AKP'ê bi saetan xwe bi îstifaya Albayrak qayil nekir û veşart. Hat gotin ku çapemeniyê bi fermana Erdogan nûçe neweşandiye... ***R.3***




## Bîlançoya vîrûsê giran dibe

Bi nêzbûna mehên zivistanê û destpêkirina rojên sar re bandora vîrûsa koronayê ya li ser civakê careke din zêde bû. Meclisa Ewlehiya Kar û Ewlehiya Tenduristiyê (ÎSÎG), di nav hefteyê de rapora xwe ya der barê bandora vîrûsê de ku li ser karkeran amade kiribû, bi raya giştî re parve kir... ***R.3***

## Ne Azerbeycan ne jî Ermenistanê qezenc kir

Şerê li Qerebaxê yê di navbera Azerbeycan û Ermenistanê de, di 27'ê îlonê de dest pê kiribû. Piştî 44 rojan jî di 9'ê mijdarê de Ermenistan û Azerbeycan bi navbeynkariya Rûsyayê agirbest îlan kirin. Ev peyman ji aliyê gelek derdoran ve wek têkçûna Ermenistanê hat şîrovekirin û gelê ermen jî bertek nîşan da. Der barê nêzîkatiya civaka ermen de Hevserokê Yekitiya Rêxistinên Kurdî ya Navneteweyî ya li Rûsyayê Arif Ezmanî û Hevserokê Kurdistan Komîte ya Ermenistanê Silo Dirboyanî ji rojnameya me re axivîn. Arif Ezmanî diyar kir ku mijara Qerebaxê ne pirsgirêkeke nû ye, ev 30 sal in didome. Silo Dirboyanî diyar kir ku ne Azerbeycan ne jî Ermenistanê qezenc kiriye... ***R.6***

# Femîsîda li ser jinên bakur û rojhilatê Sûriyeyê

**Femîsîd çi ye? Dema ku jin ji ber tundiya mêran jiyana xwe ji dest bidin, ev yek dikare wek femîsîdê bê pênasekirin. Femîsîd, sûcekî nefretê ye ku ji bo ravekirina vê yekê tê bikaranîn**

Cîhan Bîlgîn

25'ê Mijdarê Roja Têkoşîna li dijî Tundiya li Jinan a Cîhanê nêz dibe û li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dê çalakî bi pêngava 'Ji qirkirin û dagirkeriyê re na, em bi hev re jin û jiyanê biparêzin' pêk bên. Jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ên li dijî hişmendiya çeteyên DAIŞ û dewletên dagirker li ber xwe dan/didin gelek êş kişandin, berdêl dan û bi têkoşîna xwe rê nedan zilmê. Cîhan ji reşbûn û tarîtiya DAIŞ'ê xilas kirin û wekî stêrka herî geş ronî dan lê jinên cîhanê zêde li têkoşîna jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê xwedî derneketin. Çima ez vê dibejim; li ber çavê cîhanê jin li herêmên dagirkirî wekî Serêkaniyê, Efrîn û Girê Spî tên qetilkirin, tecawizkirin û firotin lê ji aliyê femînîstên cîhanê û kesên ku dibêjin em mafê jinan diparêzin ve tu bertekên tund nayên nîşandan û ev cihê şermê ye.

Tundî çiqas ji dagirkeran ne dûr be, nedîtina tundiyê jî ji hevkariyê ne dûr e. Hovîtiya leşker û çeteyên girêdayî dagirkeran a li warên dagirkirî, ne fîlmeke trajedî, tirs ne jî honak e. Tiştên li Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî pêk tên femîsîda li ser jinan e.

Femîsîd çi ye? Dema ku jin ji ber tundiya mêran jiyana xwe ji dest bidin, ev yek dikare wek femîsîdê bê pênasekirin. Femîsîd, sûcekî nefretê ye ku ji bo ravekirina vê yekê tê bikaranîn; ji embriyoyê heta cenînê, ji pitikatiyê heta zarokatiyê, ji ciwaniyê heta pîrtiyê, hemû ferdên xwedî zayenda jinê, bi tenê ji ber zayenda xwe yan jî bi hinceta têgihana nasnameya zayenda civakî, ji hêla mêrekî ve yan jî bi motîvasyona mêrekî bê kuştin an jî ji bo ku xwe bikuje, zor lê bê kirin. Femîsîd ango kuştina jinan, demek dirêj ji bo tunekirina civakan, komên etnîkî yên civakan taktîkek bingehîn e. Mîna tundiya li ser jinê û guhertina demografîk, ew beşên domdar ên pratîka jenosîdê ne.

Ne tenê bajarên dagirkî, herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê yên bi paradîgmaya civaka demokratîk, xwezayî û azadiya jinê rêxistina xwe mezintir dikin hedef in. Çi bi rêya êrîşan, gefan çi bi rêya şerê taybet ev tê kirin. Bi êrîşan nasname, ked, têkoşîna jinan dikin hedef û gef li sembola afirandina jiyana azad dixwin, bi şerê taybet jî teşhîr û xirabkirina civakê bi rêya sîxuran dikin.

Di demên dawî de li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê jinên pêşeng, têkoşer bi awayekî hov bi sûîkastan hatin qetilkirin û hîn di ajandaya dagirkeran de hedefgirtina jinan xala yekem e. Gelek jinên sîxur li herêmê hatin girtin ku bi taybetî ji bo ser fuhuşê ew hatibûn erkdarkirin. Dagirker her çiqas dibînin bi êrîşan nikarin vê vînê têk bibin êdî hewil didin di hundir de têkoşîna jinan têk bibin. Ev jî rêbazek ji rêbazên femîsîdê ye.

Efrîn, Serê Kaniyê, Girê Spî warê ku li ser paradîgmaya demokratîk, ekolojîk, azadiya jinan hat avakirin piştî dagirkirinê rewşa jinan li wir çawa ye, li warê dagirkirî çi diqewime?

Kêm be jî em hinekî behsa hovîtiya leşker û çeteyên girêdayî dewletên dagirkeran ên li warên dagirkirî bikin. Warê ku ji çeteyên DAIŞ'ê hatibûn rizgarkirin dîsa yekser ji hêla dewletên dagirker ve hatin dagirkirin. Piştî dagirkirinê çeteyan sazî, sembolên jinan hilweşandin. Li bajarê Serêkaniyê ala DAIŞ'ê aşkera hatibû hildan, çarşefa reş li jinan dikin, servekiririna jinan hatiye qedexekirin û jin tên firotin. Li Girê Spî jina ku neynûkên wê xuya kiribûn bi pensê bi awayekî hovane neynûkên wê hatin rakirin. Li Efrînê bi sedan jin hatin tecawizkirin, îşkencekirin û firotin. Yek ji mînaka qurbaniya hovîtiyê Nergîz Dadu, jinek êzidî (23) ji gundê Kemar ê girêdayî Efrînê bû. Nergîz 17'ê mijdara 2019'an bi awayekî hovane hat kuştin û şopa zêdeyî deh guleyan li ser canê wê hat dîtin.

Dema mirov van hevokan dinivîse dicemidê lê cîhan bi israr çawa van pêkanînan nabîne? Di sedsala 21'emîn de ev bêdengî pêşeroja mirovan dixe bin metirsiyan. Ji destpêka dagirkirina Efrînê ve ya di sala 2018'an de, heya niha zêdetirî hezar û 564 jin ji hêla dewleta tirk û komên çeteyên cîhadîst ve rastî êrîş û tundiyê hatin. Li gorî rapora Rêxistina Mafê Mirovan a Efrînê, ji zêdetirî hezar revandin û windakirinên jinan, bi kêmanî 290 bûyerên girtina kêfî yên hem jin û hem jî zarok hatin belgekirin. Li Efrînê 37 malên fuhuşê hatine vekirin.

Her roj jin li wan herêmên dagirkirî tên qetilkirin. Jinên cîhanê çima bêdeng in? Ev bêdengî dihelê ku mirov bifikire gelo ev jinên tên qetilkirin ne di heman cîhanê de ne û gelek pirsên cuda. Heya niha derheqê van jinên ku rastî zilma dagirkeran tên jinên cîhanê bertekek tund nîşan nedane, bi taybetî jinên femînîst lê ji bo 25'ê Mijdarê Roja Têkoşîna li dijî Tundiya li Jinan a Cîhanê ez bawer im wê çalakiyan li dar bixin. A girîng di van çalakiyan de dê zilma li jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê cih were veqetandin? Femînîstên cîhanê û kesên ku dibejin em mafê jinan diparêzin diyar e ku xwe ji pergala dewletan nikarin xilas bikin.

Ne hêsan e li dijî hovan bi awayekî bixwe bawer û serbilind têbikoşin. Ne hêsan e tevî bêdengiya cîhanê ya li hember qetilkirina jinan, civakeke demokratîk, ekolojîk û bi azadiya jinan hûnandî bê avakirin. Nivîsandina vê her çiqas hêsan be jî dayîna têkoşîn û têkbirina dagirkeran kedek mezin dixwaze. Her çiqas hewildanên femîsîdan li ser jinan hebin jî wê têkoşîna jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê hîn zêdetir tarîtiyê ronî bike.

Di 25'ê Mijdarê Roja Têkoşîna li dijî Tundiya li Jinan a Cîhanê de, haylêbûna tundiya li jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê wê hişmendiyeke rast û baştir ava bike.





Biyan

Munewer Azîzoglu Bazan

## Ji 'axa bav û kalan' ber bi 'axa hemû kurdistaniyan'

Rolên mêran ên di pêvajoyên şer û pevçûnên navxweyî û derveyî de malûm in. Hewceyî ji nû ve kifşkirinê nake. Her roj bi her awayî em bi encamên wan re rûbirû dimînin.

Li hêla din tê dizanîn di şer û pevçûnan de ji xeynî aliyên wan ên dîrokî, çandî, aborî û hwd. aliyê zayendî (gender) jî ji bo têgihiştinê roleke pêwîst dilîze. Çi bûyer be ferq nake, bêyî fêmkirina aliyê zayendî bê şîrovekirin ew bûyer kêm dimîne û nikare alikariyeke mayînde ji bo çareseriya pirsgirêkan bike. Her wiha dîsa rastiya ku dibêje şer û pevçûn herî zêde bandorê li jin û zarokan dikin, êdî ji hêla hemû dost û dijminan ve tê zanîn. Hewceyî bi dûrçûyînê nake, em her roj li Kurdistanê bi mînakên ku vê tespîtê piştrast dikin re rûbirû dimînin. Ez bawer im, dîlgirtina jinên êzidî dê ne tenê di bîra me kurdan a dîrokî de, her wiha dê di ya mirovahiyê de jî wek wêneyekî sereke yê vê mijarê xwe her tim biparêze: Di sedsala 21'emîn de bi hezaran jinên kurd li bazaran hatin firotin.

Ger me 30-40 sal berê ev tişt bijiya, me yê wek jinên kurd bangewazî li mêrên kurd bikira û bigota "kurdno, mêrno, bav û birano! Bila xîreta we qebûl neke, rabin ser pêyan û jin û keçên xwe xelas bikin!" Lê şikir ne em li çil sal berê bûn, ne jî jinên kurd jinên çil sal berê bûn. Rabûn wek şêrejinan xwe xemilandin, xwe bera ser ruhên dijminan dan. Hemû cîhan kirin şahidê rûkenî û dilêriya xwe. Ev jî hewceyî dubareyê nake.

Jinên kurd wek yek ji endamên vê axê (ez ê peyva 'xwediyê axê' bi kar neynim. Lewre em wek mirov ne xwediyê axê ne; ger xwediyek hebe ew jî 'ax û xweza' ye) hemû serpêhatiyên vê axê û vî welatî pê re dijîn. Çi êş be, çi şahî be, çi şer be, çi aştî be, her tim pê re jiyane, hîn dikin û dê her tim jî bikin. Li serê çiyê, li bejahiyê, li nav mal û kolanan têdikoşin, dimirin, tên kuştin, birîndar dibin. Dîsa jî xwedî deng û ziman in, li ser piyan e û xwedî çareseriyê ne. Laçika spî ya ku herkes ji xwe re maneyekê jê derdixe, ne tenê sembola aştiyê ye, di heman demê de rola jinan a dîrokî nîşanî me dide. Lê ev rol êdî ne tenê navbeynkarî ye. Jin jî xwedî aliyekî ne û ev alî divê berjewendiya axê, jinan û mirovahiyê biparêze.

Wê demê çima hîn jî di gotinên 'axa bav û kalan' û 'birakujî' de israr heye? Ev ax ne tenê ya 'bav û kalan' e, ne jî 'birakujî' tenê birayan dikuje. Ev ne tenê gotinên kevnare ne ku pirî caran mirov xwe dispêrin vê sedemê û bikaranîna wan meşrû dikin. Di nav van gotinan de hişmendiyeke serdest a veşartî heye. Ya rastî veşartî nîne, aşkera ye, her roj xwe dixe nav çavên me. Ev gotin di heman demê de feraseta şer û pevçûnên ku ji hêla mêran ve tên derxistin dide der. Çi çavbirçitiyek, di xwe de israrkirinek, pozbilindiyek, bêhurmetiyek e ku her tiştî ji xwe re meşrû dibîne. Xwediyê av û axê ye, xwediyê şer û aştiyê ye, xwediyê jin û zarokan e, xwediyê pêşeroja kurdan e. Heta ev gotin ji dev û lêvên me, ji hişên me dûr nekevin dê her tim hebûna xwe wek siyeke reş li ser me bidin hîskirin.

Rexneya li ser dîroknivîsiyê ku dibêje tenê dîroka serdestan hatiye nivîsandin û ravekirin, ne tenê ji bo serdestan derbasdar e. Di dîroka bindestan -çi nivîskî çi devkî- de jî ev newekhevî û hegemonî tê dîtin. Di pêşketina tekoşîna neteweyên bindest de jî ev têkiliya newekhev di çend mijaran de derdikeve pêş. Dema dîroka bindestan xwe ji bandor û referansên dîroka serdestan xelas neke, ew jî dibe wek wê. Ev yek bi taybetî di neditîn û îgnorekirina jinan de, çand û olên hindikayî de xwe dide der. Di vê çarçovê de dîroka (tekoşîna) kurdan jî -çi nivîskî çi devkî- wek dîroka mêran dikare bê pênasekirin. Jin tenê di keviya dîrokê de wek çend îstîsna xuya dikin. Ji xeynî vê jin dayik in, xwişk in, hevjîn in, alîgir in û hwd. Dema xwe ji lat û zinaran diavêjin jî ji bo 'parastina namûs û şeref'a xwe tên pîrozkirin.

Êdî di destê me de pênûs, di devê me de ziman heye. Em wek şahidên paşeroj û roja xwe ya niha, çalakiyên xwe yên li ser lat û zinaran û bi laçika spî bixwe dinirxînin. Em êdî nahêlin ne lat û zinarên vê axê ne jî laçikên spî yên jinan bibin amûrên dîroka serdestan. Em ji hêlekê ve behsa dîroka bav û kalan û bandora wan a ser vê axê dikin lê li hêla din bi çavên serê xwe, bi mêjiyê xwe, bi serboriyên xwe vê axê û vî welatî şîrove dikin. Dîroka Kurdistanê û bûyerên ku niha li ser vê axê diqewimin ji perspektîfa jinê û zayendî şîrove kirin dê deriyekî nû ji me re veke. Ev derî aliyê jina kurd a çalak nîşan dide. Êdî ne tenê navbeynkara bêdeng e. Li hemberî şer û pevçûnên 'bav û kalan' rola laçika spî ji nû ve tê nivîsandin; li hemberî dîroka 'axa bav û kalan' dîroka 'axa hemû kurdistaniyan' tê nivîsandin.

## Budçeya herêma Kurdistanê birîn

Parlamentoya Iraqê, li ser projeya qanûna deynên Iraqê yên derve civiya. Berovajiyê lihevkirina di navbera aliyan de di projeyê de hat xwestin ku para herêma Kurdistanê ya deynên derve, bi radestkirina neftê were birîn. Fraksiyonên kurd li dijî vê birîna para herêmê derketin û tev li civînê nebûn. Li gel vê yekê jî bi piraniya dengan proje hate pejirandin û 320 milyar dînar ji budçeya herêma Kurdistanê hate birin. **BEXDA**

## Bi çekên cerdevanan şer kirin

Li gundê Xirbê Kurik ê navçeya Şemrexê ya Mêrdînê, li ser erd di navbera du malbatan de nîqaş derket. Di nîqaşê de malbata cerdevan bi çekên cerdevaniyê êrîş bir ser malbata li hemberî xwe. Di encama vê êrîşa bi çekên cerdevanan de Hamît Ozkan bi giranî birîndar bû û Hamdiye Ozkan û Mehmet Ozkan jî sivik birîndar bûn. Piştî bûyerê Cevdet Ozkan ê cerdevan û 2 kurên xwe ji aliyê cendirmeyan ve hatin binçavkirin. **MÊRDÎN**

## Rapora ÎHD'ê: Leşkerên Îranê Baga kuştine

Leşkerên Îranê di 6'ê cotmehê de li gundê Çiliya Jorîn ê navçeya Ebexê ya Wanê, bi çekan êrîş biribûn ser welatiyê bi navê Şefîk Baga û ew kuştibûn. Şaxa Komeleya Mafê Mirovan (ÎHD) a Wanê, der barê kuştina Baga de raporek amade kir. ÎHD'ê di rapora xwe de diyar kir ku leşkerên Îranê bi qasî 250-300 metre derbasî aliyê Tirkiyeyê bûne û sînor îhlal kirine. ÎHD'ê da zanîn ku leşkerên Îranê di nav sînorên Tirkiyeyê de Şefîk Baga kuştine. **WAN**

## Bi fermanê ji gorê hat derxistin

Li navçeya Nisêbînê ya Mêrdînê, bi fermana Fermandarê Cendirmeyan ê Navçeyê Fatih Dogan, gora Abdulhamit Keskîn ê di sala 1995'an de jiyana xwe ji dest dabû hat guhertin. Bêyî ku agahî bidin malbatê cenazeyê Keskîn ji goristanê derxistin. Piştî cenaze ji goristanê derxistin tenê destûr dan ku bav û birayê Keskîn tev li definkirina cenaze ya li goristana Mohris a Navçeyê bibin. Bi angaşta Keskîn endamê rêxistinê ye cihê gora wî hat guhertin. **MÊRDÎN**

## 3 girtiyan dest bi greva birçîbûnê kir

Komeleya Mafê Mirovan a Kurdistanê, ragihand ku li girtîgeha Ûrmiyeyê girtiyên siyasî yên kurd ên bi navê Keywan Reşozade, Kameran Qasim û Ûmîd Seîd, ji ber nediyariya aqûbeta doza xwe, dest bi greva birçîbûnê kirine. Hêjayî gotinê ye Reşozade, Qasim û Seîd par ji aliyê hêzên rejîma Îranê ve hatibûn binçavkirin û girtin. **ÛRMIYE**

# Pirsên girtiyên nexweş bê bersiv man

*Sala 2020'an girtîgeh ji bo girtiyên siyasî yên nexweş bûn goristan û 21 girtiyan li wan jiyana xwe ji dest dan. Li gel vê rewşê jî wezîrê edaletê Abdulhamît Gul pirsên parlamenterên HDP'ê yên der barê girtiyên nexweş de bêbersiv hişt*

Navenda Nûçeyan

Li girtîgehan girtiyên nexweş ji ber ku nayên dermankirin û serbest nayên berdan yek bi yek jiyana xwe ji dest didin. Li gorî rapora wezareta edaletê ku ji bo budçeyê şand meclisê, li Tirkiyeyê 355 girtîgeh û 282 hezar û 703 girtî hene. Li gorî dane û raporên Komeleya Mafê Mirovan (ÎHD) 604 jê giran bi giştî Hezar û 605 girtiyên nexweş li van girtîgehan in.

Girtiyên nexweş gelek nexweşî bi wan re hene û ji ber di nav şertên giran de dimînin û nayên dermankirin, ji ber vîrûsa ku belav bûye nikarin biçin nexweşxaneyan û bên dermankirin. Dîsa girtiyên nexweş ji aliyê darazê ve weke 'dijmin' an jî 'ji bo civakê kesên bi zerar e' tên pênasekirin. Daraz bi hinceta girtiyên nexweş 'Ewlehiya civakê dixin talûkeyê' bernade.

Ji ber van şertên giran ên li girtîgehan di 11 mehên sala 2020'an de 21 girtiyên nexweş jiyana xwe ji dest dan. Herî dawî di 11'ê mijdarê de girtiyê nexweş Sitki Berktaş jiyana xwe ji dest da. Berktaş li Girtîgeha Tîpa F a Tekirdagê girtî bû û ji ber xwîn ji mîdeya wî tê ew radikin Nexweşxaneya Dewletê ya Edîrneyê û li nexweşxaneyê jiyana xwe ji dest dide.

**'Mînaka têkoşînê'**

Berktaş 28 sal bûn girtî bû û cenazeyê wî li navçeya Çermiktî ya Meletiyê hat definkirin. Malbat, parlamenterên HDP'ê Ayşe Surucu, Kemal Bulbul, Mehmet Ruştu Tiryakî û gelek kes tev li merasîma cenazeyê Berktaş bûn. Di merasîma cenazeyê parlamenterê HDP'ê yê Antalyayê Kemal Bulbul destnîşan kir ku jiyana Berktaş mînakeke mezin a têkoşînê ye.

Li aliyê din, Wezîrê Edaletê yê Tirkiyeyê Adbulhamît Gul, tev li hevdîtinên budçeya sala 2021'î bû û pirsên parlamenterên muxalefetê yên der barê wezareta xwe de bersivandin. Parlamenterên HDP'ê li vir rewşa girtiyên nexweş anîn rojevê û der barê rewşa girtiyên nexweş û girtîgehan de pirs ji wezîr Abdulhamît Gul kirin. Gul, pirsên parlamenteran ên di vê der barê de bêbersiv hişt.



# Albayrak ji kîsê çapemeniya alîgir çû

Qedrî Esen

Krîza aborî ya li Tirkiyeyê hat wê astê ku di nav hefteyê de AKP'iyan xwe bi xwe rexne li hev kirin. Kesên mîna Bulent Arinç ku bi salan di nav AKP'ê de siyaset kirine, rasterast zavayê Erdogan wezîrê darayî û xezîneyê Berat Albayrak kirin hedef. Van kesan bi awayekî hevpar gotin ku krîza aborî li welat heye û divê hikûmet jî vê yekê qebûl bike.

Ji ber van rexneyên navxweyî yên partiya xwe serokkomarê Recep Tayyîp Erdogan Serokê Banqaya Navendî ya Tirkiyeyê guhert û wezîrê xwe yê berê Nacî Agbal li banqayê wezîfedar kir. Ev guhertina Erdogan gelek li zora zavayê wî Berat Albayrak çû. Piştî çend saetan li ser hesabê xwe yê înstagramê ragihand ku wî ji wezîrtiyê îstifa kiriye.

**Ker û lal bûn**

Li gel ku ev îstifa ji hêla Albayrak bixwe ve hat ragihandin û dinya alem pê hesiya jî çapameniya alîgirê AKP'ê bi saetan xwe bi îstifaya Albayrak qayîl nekir û veşart. Heta hat angaştkirin ku beriya îstifaya xwe Albayrak ji bo îstifayê bi çapameniya alîgir re ketiye diyalogê lê ji ber ku qebûl nekirine, Albayrak ji neçarî îstifaya xwe li ser hesabê xwe yê înstagramê ragihandiye.

Hikûmet jî bi heman rengî weke çapameniya xwe bêdeng bû û ji bo îstifaya Albayrak tu şîroveyekê nekir. Piştî 27 saetan bi awayekî fermî ji hêla AKP'ê ve der barê îstifaya Albayrak de daxuyanî hat dayîn. Bi zimanekî sosret îstifaya Albayrak weke daxwaza efûyê hat ragihandin û hat destnîşankirin ku daxwaza efûyê hatiye qebûlkirin.

**Ragihandina qebûlkirina îsitifayê**

Weke te zanîn efû ji bo sûcên kirî tê xwestin. Ji ber vê jî bivê nevê ev pirs tê hişê mirov; gelo di nav AKP'ê de îstifa weke sûc tê hesibandin? Ya jî sûcên ku li dijî civakê kirine bi vê têgehê (efû) ew jî qebûl dikin? Heke bersiv qebûlkirina sûc be, efû ne ji serkêşê sûc ji kesên ku li hemberî wan sûc hatiye kirin, bi gotineke din ji civakê tê xwestin. Divê ev jî bê zanîn.

Bi daxuyaniya hikûmetê re her çiqas bi wan nexweş be jî çapameniya alîgir ku ker û lal bûbû, êdî îstifaya Albayrak qebûl kir. Neçar ma ku krîza di navbera AKP'ê de, di rûpelên xwe de û li ser ekranên xwe bide. Erdogan, li şûna zavayê xwe Albayrak ku li ber dilê çapameniya wî gelek şîrîn bû! wezîrê xwe yê berê Lutfî Elvan peywirdar kir.

**Hê hert tişt neqediyaye**

Piştî krîz û peywirdarkirinên nû pereyê tirk tiştekî hindik li hemberî dolar û eûro bi qîmet bû lê ev nayê wê wateyê ku krîz aborî ya li welat derbas bûye û krîza di navbera AKP'ê de bi dawî bûye. Lewre kesê xwediyê nesîhetê hê neaxiviye û nêrînên xwe yên der barê rewşa heyî de neaniye ziman. Biaxiviya û rêçên kûçik û hespan ji hev cihê bikira wê baş bûna!

Dibe ku di rojên pêş de krîza di navbera AKP'ê de hê mezintir bibe û hinek parlamenterên AKP'ê derbasî partiya Ahmet Davûtoglû û Alî Babacan bibin. Di rewşeke wiha de guhertina ku ji ber ve yekê di rêveberiya aboriyê de pêk hat, wê pere neke. Îhtîmal heye ku komên di nav AKP'ê de li ser vê guhertinê li hev bidin û gelek kirêtiyên ku heta îro veşartine derxin holê.



## 368 kesan jiyana xwe ji dest dane

Bi nêzbûna mehên zivistanê û destpêkirina rojên sar re, bandora vîrûsa koronayê ya li ser civakê careke din zêde bû. Ji bo vê yekê bergiriyên ku di havînê de hatibûn terkkirinê careke din tên girtin û tê xwestin ku bi vê bandora vîrûsê ya li ser civakê bê kêmkirin lê weke pêvajoya beriya niha dîsa karker ji aliyê desthilatê ve hatin jibîrkirin û ji bo wan ti bergirî nehatin girtin.

Meclisa Ewlehiya Kar û Ewlehiya Tenduristiyê (ÎSÎG), di nav hefteyê de rapora xwe ya der barê bandora vîrûsê de ya li ser karkeran amade kiribû, bi raya giştî re parve kir. Di raporê de hat destnîşankirin ku karker bi vîrûsê re rû bir û hatine hiştin û çalakiyên wan hatine qedexekirin. Li gorî raporê ji destpêka pandemiyê ve bi 100 hezaran karker bi vîrûsa koronayê ketine û herî kêm 368 karker pê jiyana xwe ji dest dane. Li gorî raporê bajarên ku herî zêde karker jiyana xwe ji dest dane Stenbol, Enqere û Amed in.

**Daxwazên karkeran**

Her wiha di raporê de têkildarî vîrûsa koronayê ji bo karkeran çed daxwaz hatin rêzkirin. Çend daxwazên ku di raporê de hatin rêzkirin wiha ne:

* Divê Covid-19 ji bo kekdarên tenduristiyê weke nexweşiya pîşeyî û ji bo karkerên beşên din jî weke qezaya kar bê nasîn.

* Karkerên ku nexweşiyên wan ên kronîk hene û temenê wan mezin divê neyên xebitandin û bi pere destûr bên hesibandin.

* Divê derxistina ji kar bê qedexekirin.

*Divê saetên xebatê bên kêmkirin.

* Divê bê pere testên karkeran bên kirin û kargehên ku pêketiyên vîrûsê li wan zêde dibin hilberandinê bên rawestandin. **STENBOL**

HEWCEDARIYA ME BI REXNE Û NIRXANDINAN HEYE

# Eleqeya temaşevanan zêde ye

Navenda Nûçeyan

*Xwînerên hêja, hûn mêvanê xwe yê îro ji lîstikên şanoyê yên wekî Cembelî û Binevş, Kelemê Evînê (Derwêşê Evdî), Çiya Gihîşt Behrê, Xewnek Şeva Havînê, Hamlet û gelek lîstikên din nas dikin. Vê hejmarê me der barê kar û xebatên şanoya kurdî de, hevpeyvîna xwe bi derhêner û lîstikvanê şanoyê Yavuz Akkuzu re kir.*

**Nêzî 7-8 meh in hûn dûrî dikê bûn. Wekî şanoger dûrketina ji ser dikê û şanoyê bandoreke çawa li we kir?**

13'ê adarê pandemî dest pê kir û bi awayekî fermî şano hatin qedexekirin. Heta wê demê jî me her hefte lîstikên xwe dilîstin û em diçûn tûrneyên xwe. Me digot herî zêde ew ê mehek an du mehan bidome lê mixabin pir domiya. Ji ber vê yekê em di mala xwe de bûn, em nikarîbûn bihatana ba hev û bixebitiyana. Gelek plan û bername, tûrne û lîstikên me hebûn. Ji hêla afirîneriyê ve kêmasiya me çêbû û projeyên me di dilê me de man. Ev tişt jî heye, mesela dema tiştek tê serê kurdan zû bi zû dikarin bi ser hev ve bînin; di pratîka kurdan de ev tişt tim wisa çêbûye. Mesela şer û qedexekirin çêbûne lê bi awayekî civiyane, organîze kirine û alternatîf afirandine. Me jî got em nikarin wisa di mala xwe de bisekinin û bi vî awayî amadekariya projeya 'Hinek Henek'ê dest pê kir. Berê jî di nav planên me de hebû; me digot belkî em havînê çêbikin, me di dawiya meha adarê de dest bi projeyê kir. Em bi hevalan re civiyan; me plan û bernameyên xwe çêkirin; ji bo nivîsandina skecan nivîskar û temaşevanên xwe haydar kirin û lîstikvanên xwe organîze kirin. Me ji bo dekorê sêwirneriya dekorê çêkir û her tişt amade kirin. Heta di meha tîrmehê de gotin di fermiyetê de hûn dikarin salonên xwe vebikin, me jî dest pê kir.

Di vê demê de me got em ji hêla hunerî ve neafirînin nabe û me Hinek Henek amade kir. Ji xeynî wê projeya Elîzabeth li ber destê me bû, di wê navberê de me amadekariya dramatolojiya lîstika Elîzabethê kir.

**Projeya Hinek Henek ji kîjan komên şanoyê pêk tê? We di dema pandemiyê de bi awayê onlîne çi xebat dikirin?**

Bi awayê onlîne me tiştên nû çênekirin. Lîstikên berê, me li ser qenala xwe ya youtubeyê pêşkêş kirin. Projeya Hinek Henek, ji 4 komên şanoyê pêk tê; ji Stenbolê Teatra Jiyana Nû, ji Wanê Tiyatroya Mencel, li Amedê Tiyatra Yekta Hêvî û Şanoya Bajêr ya Amedê, ji Êlihê jî hevalê me şanoger Abdullah Tarhan tev li vê komê dibe, em bêjin ji 4 kom û hevalekî pêk tê.

**Wek şanoger û bi taybetî şanogerên kurd, çi zehmetî derdikevin pêşiya we, hûn çi zehmetiyan dikişînin di karê şanogeriya kurdî de?**

Zehmetî ji hêla hunerî û ji hêla polîtîk ve jî hene. Mixabin di meha borî de, beriya 20 rojan li Stenbolê lîstika Bêrû ya Teatra Jiyana Nû hat qedexekirin. Yanî 3 sal in Bêrû li Stenbolê tê lîstin. Tişta ez dizanim polîs jî çûne li lîstikê temaşe kirine, di lîstikê de tiştekî qedexe tune ye. Lîstik ya Dario Fo ye, hevalên me tiştek lê zêde nekirine. Min bixwe pênc caran lê temaşe kiriye. Waliyê Stenbolê digot propagandaya PKK'ê dike lê tiştekî wisa tune ye, ew ji kokê de derew e. Mesela ka çima ev lîstik hat qedexekirin? Beriya 2 salan me yê li Edeneyê festîvala şanoyê çêbikira, HDP'ê organîze kiribû, ew jî hat qedexekirin. Li vir dema lîstika me dest pê dike, polîs li ber devê derî ne. Em pêşangehekê saz dikin polîs tên wêneyan dikişînin ka çi ye!

Heta niha rasterast şanoya me nehatiye girtin lê ev tişt çawa tesîrê li me dike? Em bibêjin ji hêla psîkolojîk ve zirarê dide me. Temaşevan dinihêrin vaye polîs li ber derî ne, nayên lîstikê temaşe nakin. Di van hêlan de şikestin çêdibin. Belkî em bixwe jî ferq nakin lê em dikevin bin bandora otosansurê. Polîs tên mirov dikeve tasewasê. Mixabin ji ber van tiştan hem sansur hem otosansur li ser şanoya kurdî heye.

Li Wan, Amed û Elihê şanoyên girêdayî şaredariyan hebûn. Li Wanê û Amedê akademiyên şanoyan hebûn her wiha akademiyên kurdî yên sînema, edebiyat, reqsa gel û muzîkê hebûn lê mixabin di 2016'an de qeyûm hat û ev tev hatin girtin. Ji hêla hunerî ve van akademiyan bingehek çêdikir, pirtûkên li ser şano, sînema û muzîka kurdî dihatin amadekirin, ev ji hêla hunerî ve pir serkeftî bûn. Niha kêmaniya me ev e ku xebatên akademîk ên li ser hunerê tune ne. Bingeha teorîk pratîkan xurttir dike. Bi kurtasî em dikarin bibêjin ku qedexe û polîtîkayên dewletê tesîra xwe li hunerê dike.

**Piştî qedexikirina listika Bêrû ya Dario Fo, cara ewil hûn bi lîstika heman nivîskarî ya bi navê Hema Hema Jin: Elîzabeth derketin ser dikê. Vê yekê bandoreke çawa li motîvasyona we kir? Her wiha tevlêbûn û pêşwaziya gel û temaşevanan çawa bû?**

Di şanoyê de hatina cem hev a lîstikvan û temaşevanan, tiştekî rîtuelîstîk e mesela dema meriv bi tena serê xwe li komediyekê temaşe dike meriv ewqasî nakene yan jî tiştekî trajîk be meriv bi tena serê xwe ewqasî nagirî yanî dema meriv li ba hev be şînek be êş zêde dibe, çîrokek pêkenokî be kêf zêde dibe. Ji ber pandemiyê em mecbûr in ku nêvî nêvî temaşevanan bigirin salonê. Dema ku kes kêm dibe hest jî kêm dibin. Ji hêla din ve jî temaşevan bi tirsa nexweşiyê tên temaşe dikin hişê wan li ser nexweşiyê ye û mixabin ev jî bo şanoyê rewşeke nebaş e. Yanî pandemî ne tiştekî li gor şanoyê ye lê armanca me ew e ku bi temamî qut nebe, bila kêm be lê bila berdewam be. Elaqeya gel zêde ye niha vê hefteyê lîstika me heye hema bêje salon tije bûye. Li gor ku pandemî heye lê dîsa jî gel dev ji hunerê bernade. Ev 7-8 meh in gel dûrî şanoyê ye, bêrîkirinek çêbûye. Di şanoya me de ji hêla temaşevan ve qet pirsgrêk çênebûye lê dema lîstik xerab be pirsgrêk çêdibe.



Di şanoyê de hatina cem hev a lîstikvan û temaşevanan, tiştekî rîtuelîstîk e. Dema meriv bi tena serê xwe li komediyekê temaşe dike, meriv ewqasî nakene yan jî ewqasî nagirî yanî dema meriv li ba hev be şîn be êş zêde dibe, çîrokek pêkenokî be kêf zêde dibe

**Avahiya we ya nû li ser xêrê be. Qeyûm dixwest ev der bê girtin û çalakiyên şano û hunerê bi temamî bên rawestan lê dema xwedî derketina gel hebe em dibînin bê piştgiriya şaredariyan jî mirov dikare xwe bi xwe ava bike. Tu dikarî hinekî behsa çîroka avakirina vê avahiyê bikî?**

Di serê 2017'an de me li Galerîayê salona xwe ya berê vekir, bi qasî 80 kesî bû. Em li wir nêzî 3 salan man; me 4 festîval û 12 pêşangeh saz kirin, her wiha ji bo sînema û edebiyatê jî li wir me çalakî li dar xistin. Wir ne tenê cihê şanoyê, wek navenda çandê bû lê biçûk bû têra her tiştî nekir. Temaşevanan gelek gazin dikirin û xwestin ku em derbasî cihekî nû bibin, gelek daxwaz hebûn. Paşê em hêdî hêdî me hewl da û me got em ê derbasî cihekî nû bibin. Me li ser înternetê ji bo alîkariya temaşevanan 'fongogo' vekir. Ji bo derdorên alîkariya çand û hunerê dikin proje nivîsandin, me got yên dixwazin em ê navê wan li ser paldankan binivsînin. Me bilêtên kombînan da temaşevanan. Bi vî awayî me cihê xwe yê 150 kesî çêkir. Her wiha cihê pêşangeh û workshopê jî heye. Ev xebat hema bêje nîviyê pir bi alîkariya temaşevanan çêbû. Li gor min ev tişt di zemanekî wisa ku krîza aborî heye û ji hêla rewşa polîtîk ve ku ziman, huner û çanda kurdî tê qedexekirin de, ev piştgrî cihê şanaziyê ye ji bo me. Di nav 3 mehan de her tişt hat organîzekirin û di nav 8 mehan de jî avahî qediya lê tiştekî wisa jî heye tu karekî baş bikî alîkarî heye. Ne wek berê ye, hema bêjin bi kurdî be bila çi be em ê alîkariyê bikin. Ev tiştekî baş e ji ber ku gel rexne dike, dineqîne êdî. Alîkariyeke bêrexne û bêneqandin alîkariyeke pûç e!

**Şanoya Bajêr a Amedê, lîstika nivîskarê îtalyan Dario Fo ya bi navê Hema Hema Jin: Elîzabeth (Quasî Per Caso Una Dannobi) pêşkêş kir. Gelo werger an jî adaptasyon bandoreke çawa li metna şanoyê dike? Her wiha dema ku em bala xwe didin naveroka lîstikê, lîstik ji hêla biwêj û gotinên pêşiyan ên kurdî ve dewlemend bû. Rê û rêbaz di wergerandina metneke şanoyê ya biyanî bo kurdî çi ye?**

Ev wergera mamoste Dilawer Zeraq ji tirkî wergerandiye, mixabin ne ji îtalî hatiye wergerandin. Em dixwazin ji metna orjînal wergerînin lê derfeta me tune ye. Me carekê da hevalekî ji almanî wergerand lê ji ber ku ji metna şanoyê fêm nedikir, gelek xerab bû. Divê yek ji metna şanoyê fêm bike û bi zimanê orjînal ê metnê îtalî û kurdî baş dizanibe û dikaribe wergerîne. Mixabin yekî/a wisa li derdora me tune ye. Yan na me yê ji zimanê orjînal wergeranda. Dema ku kesên wisa hebin em ji zimanê orjînal werdigerînin lê tune be mixabin em ji tirkî werdigerînin.


Di wergerê de ji bo wate tam derkeve gotinên pêşiyan û biwêj tên bikaranîn ku temaşevan tahma kurdî ji wê şanoyê bigire. Dema ku temaşevan tahma kurdî negire, wek ku li tiştekî îtalî an îngilîzî temaşe kiribe, tu wateya wê namîne. Her wiha jest mîmîk jî bandorê lê dikin. Dema ku ez dilîzim wek kurdekî tevdigerim, nabe ku rêveçûna min bibe wekî yekî îtalyan. Mesela di dema xwe de me Hamlet lîstibû, Hamlet şelwar li xwe kiribû. Yanî ev adaptekirina çandê ye. Di vê lîstika Elîzabeth de jî kostum îtalyanî bûn lê gotin, hereket û jest û mîmîkên me bi kurdî bûn. Di vir de em dixwazin têkiliyekê bi temaşevanan deynin.

**Gotina we ya dawî ji bo temaşevanan û xwînerên rojnameya Xwebûnê çi ye?**

Gava din jî min behs kiribû, ev tercîha temaşevanan a neqandinê gelekî kêfa min tîne, kêmanî di vê hêlê de tune ye lê kêmanî ji hêla huner û şanoya kurdî ve heye ew jî nerexnekirin e; çi nivîskî çi jî devkî. Mesela bên temaşe bikin û rexneyên xwe li ser medyaya civakî an bi awayekî din ragihînin. Ecibandin an neecibandin lê çima? Meseleya 'çima' di nav me de tune ye. Yanî daxwaza me ew e. Di rojname û rûpelên xwe yên taybet de ragihînin wê ji bo me baş be. Bi saya vê, ji hêla teoriyê ve em ê li xwe vegerin. Di vî alî de kêmaniyeke me ya mezin heye.

Spas û mala we ava.

## Yavuz Akkuzu kî ye?



Yavuz Akkuzu sala 1982'yan li Şemrexa Mêrdînê ji dayik bûye. Di 2006'an de li Zanîngeha Dîcleyê Beşa Mîmariyê qedandiye. Li Amedê dema xwendekar e dest bi şanoyê dike. Di 2003'yan de weke lîstikvan di şanoya "Taziye/Hewarî" ya Şaredariya Amedê de cih girt û heta sala 2017'an li wir dewam kir. Sala 2017' an bi hevalên xwe yên koma şaredariyê re şanoyek serbixwe, Şanoya Bajêr a Amedê ava dikin. Niha di koma (ŞBA) de mamostetî, derhênerî û lîstikvaniyê dike.



Kenan Colemêrgî

# Deng didin pîrepayîzokan!

*Kovandaro wê li min hatî pîrepayîz e*
*Payîzeke wektê gaw û gêran e*
*Way bendewaro dilo me nekir çi kar û barên evê zivistanê*
*Serikê serhedên jorî girtin mijo*
*Li jêrî dibarin reşeşikên evê baranê*
*Yar kijê zalimê zalim babê*
*te bo çi li zozanên jorî negote mino*
*Payîz e, mehelê şivan û beriyan e*
*Wê dikin kare dest ji berdanê*
*Keçikê dibêje; kuriko hey mala babê te xirabo*
*Hindî danê barê bît te'l min dey (deng) nekir*
*Payîzê ketî mehelê, malano barkirinê*
*Tu nika baxika sosin û beybûna ji min dixwazî.*
*Hay herê gelavêja malxirab*
*tu sibeyan ji quntara çiyayan derdikevî*
*Xeberekê bide stêran*
*Sala par vî çaxî singê şengedosta min*
*Evdala xwedê pawanê min bû*
*Sala ev sal e ji destên min çûn û ketine benda mal û mêran*
*Hey jaro ezo, min nebene di nav mexbera miriyano*
*Min bibene di nav zozanêt serhedên jorî*
*Di nav kêriyên şivan û beriyano*
*Da sibeyan bête guhê min dengê lawkeberiyano*
*Hey jaro ezo da bête guhê min dengê terz û terezbabên şivanano*
*Hey jaro w'ezê pîr bûmo dilkê jar pîr nabît*



Dikarin bi sedan rûpelan raveya her bend û peyveke payîzokan bikin; hind kur, hind xwe û cihê xwe dizanin peyvên bendên payîzokan. Weke hûn li jorê dixwînin, pîrepayîzok ew newa ne ku ji dûrmana zozanan re, ji xilasbûna dema evîniyê re, ji xema karûbarên zivistana tê re tên stirîn.

Ev stirîn û dengvedan, bi koçekê dest pê dike, bi koçeka di navbera demeke kurt û bi liv û tevgereke mezin de, heta ku xwe digihînin dîwanên malan, ev dengvedan didome. Ji ber hindê ye ku payîzok di nav xwe de gelek deng û peyvên resen dihewînin. Ji ber ku di vê navberê de deng û rengên zîndewerên deverê, deng û rengên xwezayê dibihîzin û dibînin, bêguman ji vê bihîstin û dîtinê diafirînin û deng didin.

Her mirovek bi ax û xwezaya xwe ve çûye, çawa reng û dengên ev qas zêde di nav xwe de nehewînin! Kurdan, her newayek bo dem û demsalekê, her miqamek bo liv û tevgerekê, her stranek bo mesel û bûyerekê, bi bizara dengên van deman ava kirine. Dibe ku hinek deng û selîqe bişibin hevûdu lê naverokên wan ji hev gelek cuda ne.

Selîqeyên payîzokan û heyranokan, gelek caran wekî hev in. Dengbêj selîqeyên van her du forman ji hev cuda nakin. Ji ber ku dizanin, kesên guhdarî dikin dê ji hev cuda bikin û dê bibêjin ka kîjan heyranok e û kîjan payîzok e.

Carekê hevalekê ji min pirsî û got: "Çawa dizanî ka kîjan heyranok e û kîjan payîzok e?" Min jî gotê: "Lê binêre heke xwe ji stêra gelawêjê aciz kir, xemên zom û zozanan girt, bêhêvîtiya evîniyê anî ziman û di dawiyê de jî lê zêde kir û got; ez pîr bûm, ev dilkê lalik pîr nabe; ev payîzok e lê belê heke qala evîniyekê kir û di nav de bersiva evîndarî/ê jî hebe, qala zozanên xweş, simbêlên qûrmiz, singê zer, ramûsan û hwd. kir, ev jî heyranok e."

Newa û selîqeyên payîzok û heyranokan gelek caran heman selîqe ne, ji ber ku ji heman xweza û heman xeman xwe diafirînin.

Yek ji wan dema diçin zozanan, di nav wê kêfxweşî û xwezayê de derbas dibe (heyranok); ya din jî dema ji zozanan vedigerin, di nav karê destberdanê de û ji xwezaya payîzê derbas dibe û xwe ji van hemûyan lêkve dike, lêkvebûnek heye. (Payîzok)

Bi hezaran deng hene di van navberan de ku dengbêj van ji bo gotinên xwe jê bigirin û payîzokekê biafirînin. Dengê ba, dengê çeman, dengê ajalan, dengê tevgerên laşî û helbet qadek fireh û akûstîka çiyayan...

Li cem dengbêjên payîzokan tiştek heye ku berze (wenda) nebûye; ew jî dengê jiyana koçeriyê ye. Koçer, di nav hezar dinyayan de derbas dibin û ji van hezar dinyayan bi hezaran dengan dibihin û ji wan digirin, şibandin û bizaran dikin; şibandin û bizarên xwezayê û bi dengên van bizar û şibandinan ve newayan diafirînin. Ev afirandin ne di demeke kurt de pêk tê, di nav sedan salan de û zêdetir jî.

Bi hezaran sal in kurd bi van gotinên payîzokan ve li çiya, zom û zozanên Kurdistanê şînê digirin li ber payîzê, bi hezaran sal in kurd digel çiya û zozanên xwe diqîrin bo hatina zivistanê. Şêweyeke şîngirtinê ye payîzok û li cem kurdan wekî her tiştî şingirtin jî bi hev re ye. Ji ber hindê payîzok bi devê dengbêjan ve li dîwanan weke merasîmeke pîroz tên pêşkêşkirin û gotin. Dengbêj, dema payîzê piştî derketina stêra gelawêjê heta ba û bageran di dîwanan de qîr dikin bo hatina payîzê. Di demên payîzê de li çiyayên Kurdistanê senfoniyeke xwezayî pêk tê, evîndar ji vebûna cihê evîniya xwe re qîr dikin, şivan û bêrî karê dest ji berdanê dikin û didin gotinan; çiya, deşt û zozan xwe tev li vê senfoniyê dikin. Tijî xem û kovan di nav bendên vê senfoniya payîzokan de hatine raçandin; dengên çiya, zozan, ajal û evîndaran bi bendan ji hêla dengbêjan ve ageha xemên hatina payîzê radigihînin.

*"Tu yî dibînî şivan û beriyan pez vavêr vavêr e*
*Kurikî gotê; keçikê malxirabê dîtina min û te xêr û bêr e*
*Hêj der û cîranan nezanî dereng e*
*Wê li min hatî pîrepayîz e*
*Heta sal dî vî wextî, delalê pewanê dilê min be."*

Divêt pêhesin, ji her peyvekê heta her dengek ku ji qirikê notayekê ava bike, beyana derûnnasî û muzîkolojiya van civatan dide me.

Dema mirov guhdariya bendên payîzokan dike ji bilî zanyariya dengbêjan a li ser xwezayê, mirov hay ji zanyariya dengbêjan a li ser asîmanan jî tê, kesên hay jê tên ku kurdên çiyayî li gorî livên asîmanî karên xwe yên salane verast kirine û pêk anîne.

*''Hay herê gelavêja malxirab*
*tu sibeyan ji quntara çiyayan derdikevî,*
*xeberekê bide stêran*
*tu bo çi xwe dihilavêjî di nav qembelek van hûrde stêran ''*

*"Hay herê gelavêjê, tu bo çi wey li min sar î*
*Serikê xwe dertêxî*
*Li ser belgên vî dar û barî*
*Tu bo çi heywanên bêzar dikujî*
*Her ji mişkî heta marî"*

Stêra gelawêjê li ber neteweyan şîrîn e, stêra evîniyê ye, nîşaneyeke li ber evîndaran lê li ber me kurdan ne wisa ye. Gelawêj bûye nîşaneya sar û seqemê, nîşaneya ajal kuştin û hêtkirinê, nîşaneya lêkvekirina evîndaran û dijminê evîniyê. Mezinên me her carê digotin, dema payîzok derdiket diviya pez ew nedîta, heke bidîta dê pez hêt bûya û dê şîr ji guhanên mihan avêtiba. Ji ber vê yekê pez di nav geliyên kûr de vedişartin. Helbet ji ber sermayê bû ev rewşa pezan; ji ber ku dema gelawêj derdiket zozan sar dibûn lê belê ew di wê baweriyê de bûn û ew stêra geş û law li ber çavên xwe reş kiribûn, hemû lom bo gelawêjê bûn li çiyayên Kurdistanê.

Kurd dizanin ku derketina stêra gelawêjê êdî xilasbûna havînê ye û êdî hêdî hêdî reşeşîkên baranê piştre tabiyeyên berfê dê xwe berdin ser erdnîgariya Kurdistanê û kawaniyên malan êdî dê ji zozanan vegerin, dê koçê bikin bo gundan, nêzî heşt mehan dê bimînin di binê berfê de, ji bo gelên herêmê mehên payîzê heşko mirinek e lê digel vê mirinê nîşaneya abadîtiyekê jî heye. Dibêjin bayê payîzê heke bê ji payîzokan re tê, heke payîzok hatibana digotin ba jî pê re dihat. Bayê payîzê dengê xwe nas dikir ji dengê xwe re dihat.

Dengbêj wiha dibêje: "Pîrepayîzok demên bênderan jî wekî selîqeyên pîroz dihatin gotin. Dema gundiyan bênder hildiavêtin dengbêj dest bi pîrepayîzokan dikir û pê re ba dihat û gundiyan dexlê xwe didan ber bayî.''

Di muzîka kurdî de payîzok bi newayên xwe ve cihekî cuda digire, ji ber ku hemû rewşên jiyana rojane di nav xwe de dihewîne, êşek pir giran heye lê digel êşa evîniyê bi gotinan ve tê xurtkirin û bi newayên xwe ve, hem di newayên kurdî de hem jî di nav newayên dinyayê de xwe digihîne asteke dîtir.

Di muzîka dinyayê de demek heye jê re dibêjin ''serdema romantîk'' û L.V. Beethoven li ser dinyaya romantîk a ewilî tê hesibandin, hem awazsazek romantîk hem jî awazsazek klasîk e û digel L.V. Beethoven, Ludwig Spohr, Carl Maria Von Weber û Franz Schubert jî romantîkên din in. Awazsazên kurdan nîn bûn lê bi sedan dengbêjên kurdan bi selîqe, awaz û newayên xwe ve ev teşe ji bo nifşên dû xwe vediguhastin. Ev awazsaziyeke bêhempa bû, awazên payîzê li gorî dengên payîzê raçandine, yên biharê li gorî dengên biharê, awazên bûyer û şeran li gorî dengên bûyeran raçandine û li ser van gotin li wan zêde kirine, xurttir kirine ev awaz. Awazsazên klasîk jî her xwestine wiha bikin, ji dengên xwezayê her awazan saz bikin. Helbet haya wan jê hebûye ku ji bo mirovan sazkirina van awazan pêdiviyek e. Dengbêjên me jî gelek haydar in ji vê rewşê, ji ber hindê gotin bi gotin deng bi deng ev awaz saz kirine. Sedem û armancên gelek girîng û kûr hene, çi civat ji ber xwe ve tiştên bi vî awayî ava nake. Kurdan ji hemû karên xwe, dem û livên xwe, bûyerên xwe re heke selîqe û newa ava kiribin bêguman sedemek heye. Ji van du sedemên sereke hene, yek ji wan pîroz e ya din pêdiviyek e bo pêşvebirina jiyana wan.

Belê, muzîk di jiyana kurdan de cihekî pîroz zeft kiriye. Di baweriyên kurdan ên resen yarsanî û êzdayetiyê de îbadetên bêmuzîk tên kirin kêm in. Di pirtûka yarsaniyê ya pîroz "Perdîve dînî'' de dibêje:

''Dema ku xwedê xwest rihekê bide mirovahiyê, rih xwe di bedena mirovî de nedigirt, xwedê peywir da Binyamên, Binyamên heta ku rih xwe di bedana mirovî de bigire îcrayê mûzîkê kir."

Wekî din ê tê zanîn, heft miqamên êzidiyan ên olî hene ji wan re dibêjin ''sema'' û miqamên yarsanan; Hore, More û Siyaçeman. Ev miqam, miqamên kurdan ên herî kevnare ne, her wiha miqamên dinyayê yên herî kevnare ne jî.

Di demên şahsemanitiyên Sumer, Akad, Ur, Babil û Asûran de, civakên bi muzîkê re mijûl dibin pêk hatine, di serdema Babîlan de bi bihurîna demsalan re bi teşeyên newayên cuda cuda pevgirêdanek di navbera payîz û zivistanê de, di navbera bihar û havînê de wekî hê jî kurd wiha dikin û kurd hê jî ev çanda xwe ya muzîkê vediguhezînin.

Ev deng dengên erdnîgariya Kurdistanê ne, çend şahsemanitî hatin vî welatî û neman; çend gel ji vî welatî derbas bûn, hemûyan jî stranên van çiyayan gotin lê tev bûne spartegirên dengan, bûn spartegirên dengên gelên Kurdistanê yên qedîm.

Tonalîteya muzîkê li gorî erdnîgarî û rêwiştên xwe yên cihî xwe digihîne û mezin dibe. Ji ber vê ye ku em ew gel in, me ji bo her livekê xwe newayek, miqamek, selîqeyek daniye û ji ber vê ye ku tenê bi teşeyekê yan jî tenê bi selîqeyekê ve çi tiştê hatibe serê me, me vegotiye, me bi ziman xistiye; weke evînî, qehremanî, şer, êş, xweşî û hwd...

Heke rojekê haya me ji dengên çiyayan, deşt û zozanan çêbû, em ê wê çaxê bizanibin ku ka çima dengên gelên derdora Behrareş, dengên dom an jî qereçên Balkanan yan jî dengên niştecihên amerîkayî dişibin dengên gelên Kurdistanê. Xelkekî bifikirin bi her halê xwe ve, bi her tiştê xwe ve tenê û tenê muzîk e û xelkekî bifikirin tenê û tenê bi goyendeyên xwe ve dîrok, çand û kelepora xwe veguhest nifşên dûv xwe, xelkekî bifikirin ku bi hezaran salan e şîrikatî û dengbêjiya wan çiyayan dike.

Heta ku gêlawêj agahiyekê bigihîne stêran hûn bifikirin, wekî her stran û kilamekê divê nivîs jî heta cihekê bin lê divê nivîsên li ser payîzokan jî wekî payîzokan biqedin.

*Hey lo bendewaro dilo w'ezo,*
*ez pîr bûmo, bo çi ev dilkê lalik pîr nabît...*

**Nîşe:**
**Mehel: Dem**
**Lawkeberî: Beriyên Delal**
**Vavêr: Ji nav hev girtin, jêk vekirin**
**Qembel: biska jinan a zêde**

# ‘PDK li gor berjewendiya Tirkiyeyê tevdigere’

Navenda Nûçeyan

**Rojnameger Şaswar Mame der barê bûyerên li Başûr de û têkiliya PDK’ê ya bi Tirkiyeyê re axivî. Mame diyar kir ku PDK li başûr li gorî berjewendiya Tirkiyeyê tevdigere û destnîşan kir ku gelek deverên Başûr di bin kontrola Tirkiyeyê de ne**

Di van rojên dawî de tê zanîn ku ji çar parçeyên Kurdistanê metirsiya şerê di navbera hêzên kurdan de hat rexnekirin û ji gel, sazî, siyasetmedarên kurdan nerazîbûn û bertek hatin nîşandan. Li gel van rexne û bertekên ku ji çar perçeyan bilind bûn, dîsa jî PDK’ê bicihkirina hêzên xwe yên leşkerî piştî Zînê Wertê û Garê li Ranya-Ruwanduz û li Dînartê Sorçiyan (Akrê) berdewam kir.



Der barê mijarê û têkiliya PDK- Tirkiyeyê de rojnameger Şaswar Mame yê ev 16 sal in hem li Bakur hem jî li Başûr rojnamgerî dike, axivî. Mame diyar kir ku armanca bicihkirina hêzên Gulan û Yekîneyên Heştan veşartina qeyrana aborî ya li herêmê ye.

Têkiliyên li ser esasên şer hatine avakirin, rojnameger Mame bal kişand ser têkiliyên PDK-Tirkiyeyê û da zanîn ku ev têkilî ne nû ne, ji avakirina Parlementoya Herêma Kurdistanê ve hene, li ser hin esasan hatine danîn û wiha got: “Parlementoya Başûr bi hemû partiyên xwe ve alikariya Tirkiyeyê dike û li hember bizava siyasî, kurdistanî yên li perçeyên din in. Ji serê ser de têkiliyên PDK-Tirkiyeyê li ser vî esasî ava bûne. Her çiqas ev wek têkiliyên parastina mafên aborî, çandî xuya bikin jî di bingeha xwe de ev têkilî li ser xeteke leşkerî dimeşin .”

**Sîxurên li herêmê**

Şaswar Mame diyar kir ku her çend di salên dawî de şerekî rasterast di navbera PDK û PKK ê de çênebûbe jî nakokî her hebûn û wiha domand: “PDK’ê ji gelek aliyan ve alîkariya Tirkiyeyê dikir. Di nav bajarên herêmê de sîxurên dewleta tirk bi cih bûne û bi taybetî li bajarên ku di bin bandora PDK’ê (Hewler, Duhok û hwd.) de sîxur û bi hezaran leşkerên dewleta tirk tijî bûne. Ev hemû rêkeftin bûye di navbera PDK-Tirkiyeyê de.”

**Kaos û qeyran**

Rojnameger Mame aşkera kir ku ev demek e dirêj e ji ber sedema polîtîkayên PDK’ê, Başûr di nav qeyranekê de ye û ji bo vê jî qeyranê bi şer vedişêre û ev tişt anî ziman: “Em dizanin ku PDK şêweya ‘kaosê derîne, kêmasiyên xwe veşêre’ ji siyaseta Tirkiyeyê hîn dibe. Çawa ku Tirkiye dema pirsgirêkên xwe nikaribe çareser bike, li Rojava, Lîbya û Qerebaxê şer derdixe, PDK jî heman siyasetê dike. Îro tê zanîn ku li herêmê hem têkiliyên siyasî hem ên aborî di nav qeyranekê de ne. PDK, bi derxistina şerê li hember hêzên kurd, dixwaze gendelî û aloziyên mezin veşêre. Bi vî awayî jî rewşa xerab a gelê Başûr û nakokiyên xwe yên di navbera dewleta Iraqê de, tune nîşan bide. Ji bo vê yekê jî dixwaze atmosfera şer ava bike û berê civaka Başûr ji van qeyranên navxweyî dûr bixe. Yanî şer rewa dike.”

**Partiyên din şer naxwazin**

Mame destnîşan kir ku PDK îro tenê ne bi PKK’ê re bi Tevgera Goran û YNK re jî pirsgirêkan dijî û wiha pê de çû: “Her tim ew amade ne ji bo şerekî navxweyî! Rastiyek heye ku partiyên din vî şerî naxwazin. Bi polîtîkayên PDK’ê re îro em dikarin bêjin ku Tirkiye, parlamentoya Başûr û heta hemû avahiyên herêma Kurdistanê; hikûmet, parlemento, saziyên fermî qontrol kirine. Saziyên çandî heta yên medyayê (tv, radyo) yanî çapemenî tev nûnertiya Tirkiyeyê dikin. Ji avakirina navendên xwendinê heta çand, aborî û navendên perwerde û ragihandinê hemû di bin bandora Tirkiyeyê de ne. Dagirkeriya herî mezin jî ev yek e!”

**Sedema rawestandina diyalogê**

Di axaftina xwe de Şaswar Mame bal kişand ser diyaloga kurdî-kurdî ya di navbera ENKS-PYNK’ê de tê meşandin lê ev demeke hatiye sekinandin û wiha got: “Em dikarin bêjin ku Tirkiye tişta ku nikare îro bike bi PDK’ê dide kirin û ji bo destkeftiyên kurdan têk bibe di navbera kurdan de şer derdixe. Yanî derxistina şerê di navbera hêzên kurdan de bi Rojava re jî girêdayî ye. Ji ber ku Tirkiye dixwaze deskeftiyên li Rojava têk bibe û bi rêya PDK’ê şer di nav kurdan de derdixe. Bûyerên heyî yên îro li Rojava girêdayî van nakokiyan e. Hevdîtinên kurdî-kurdî yên di navbera ENKS û PYNK’ê de ev demeke sekinîne û ev jî bi vê nakokiyê ve girêdayî ne. Ji ber ku ev demek bû jixwe hevdîtinên di navbera ENKS-PYNK’ê de bi awayekî lawaz be jî didomiyan. Piştre her çû ENKS hin merc derxistin pêş (wek zimanê perwerdeyê û sîstema hevserokatiyê). Mirov nikare vê nêzîkatiya ENKS’ê ji nakokiyên PDK’ê cuda bike. Bi vê yekê xwestin atmosfereke wisa derkeve holê ku êdî şerê di navbera kurdan de rewa bikin.”

**‘Efrîna duyemîn’**

Rojnameger Mame anî ziman ku siyaseta Başûr ne siyaseteke xweser e û ji bo vê jî li herêmê roj bi roj deskeftiyên kurdan ji dest diçin û wiha got: “Li Kerkûkê û li hemû herêmê heta niha polîtikayên Tirkiyeyê nerm bûn û zêde nedihatin ferqkirin lê îro em dibînin ku bingehek ava kiriye û bi vî awayî dagir dike. Di rojên pêş de jî jixwe bi mudaxaleyên leşkerî gelek herêman dixin qadên şer. Gelek herêm jî bûne qadên şer ên leşkerên tirk. Bi dehan kîlometre ji aliyên Duhok û Hewlêrê û navçeyên din ve ketine bin dagirkeriya Tirkiyeyê û leşkerên wan niha li wir in. Dixwazin niha hê zêdetir axa Başûr dagir bikin. Mantiqa dewleta tirk ew e ku dema deverekê dagir dike êdî venakişe. Piştî wê dagirkirina Tirkiyeyê dê rêveberiya herêmê jî nikaribe bide sekinandin. Dê bibe Efrîna duyemîn! PDK jî vê rêhavaltiyê li ser navê Rêveberiya Herêm Kurdistanê dike.”

**Rewşa aboriya Başûr**

Di salên dawî de qeyrana aborî li Başûr her diçû zêdetir dibû. PDK jî xwest aboriyeke xweser ava bike û li ser vê yekê bi dewleta tirk re peymanek danî. Li gorî vê peymanê heta 50 salan dê petrola xwe bi rêya Tirkiyeyê bifiroşin.

Şaswar Mame der barê rewşa aborî de ragihand ku ji ber ketina buhayê petrolê rewşa herêmê her çûye xerabtir bûye û wiha domand: “Di vê meseleyê de jî nezelaliyek mezin heye ku PDK nikare tu gavan li hember Tirkiyeyê biavêje. Tê zanîn ku bi navên şîrketên cuda dahata petrola Başûr tev diçe Tirkiyeyê. Ew navendên tîcarî yên girêdayî malbata Barzanî yên li Tirkiyeyê her tim di bin gefan de ne. Li gor agahiyên ku Wezareta Aborî ya Herêma Kurdistanê ragihandiye, di pêvajoya petrolê ya di navbera Başûr-Tirkiyeyê de Herêma Kurdistanê 500 milyon dolar ji Tirkiyeyê deyn kiriye. Ev jî ji hikûmeta herêmê re pir zêde ye û barekî giran e. Hikûmeta herêmê bi siyaseta PDK’ê kete bin van deynan. Tirkiye jî vê meseleyê ji bo berjewendiyên xwe bi kar tîne û her tim zextê li PDK’ê, partiyên din û hikûmeta herêmê dike ku li gor van berjewendiyên Tirkiyeyê tevbigerin.”

**Propagandaya tirkmenan!**

Mame derheqê parlementoya Başûr de hin agahiyên balkêş jî parve kirin. Mame aşkera kir ku ev demeke dirêj e bi bandora Tirkiyeyê, li parlamentoya Başûr propagandaya şerkirinê ji aliyê parlamenterên tirkmen ve tê kirin û wiha pê de çû: “Mînak di hikûmeta nû de wezîrek ji partiya tirkmenan heye. Em her roj dibînin ku daxuyaniyên li dijî hebûna PKK’ê didin û dibêjin ‘PKK’ê Başûr dagir kiriye. Ew bûye sedem ku aramiya van navçeyan xera bibe û hêzek terorîst e.’ Tevî vê yekê hin parlamenterên tirkmen ên din jî tev li vê siyasetê dibin û dibêjin Hewlêr bajarekî tirkmenan e. Bi awayekî siyasî di parlamentoyê de propagandaya tirkmeniyê dikin.”

**‘Propagandaya şer dikin’**

Rojnameger Mame di dawiya axaftina xwe de anî ziman ku ew kesên şer dixwazin bi bandora Tirkiyeyê dikevin vê xetereyê û wiha got: “Hewce ye hemû kurd vê yekê baş bizanibin ku navçeyên ev 30 sal in PKK li wan e heta niha metreyek jî bi pêş ve nehatine. Gelo niha xêr e ku propagandeya şerê li dijî PKK’ê dikin! Ev hemû propagandayên şerê taybet in û dixwazin şer rewa bikin. Her kes dizane ku ev 20-30 sal in PKK li ku ye! Me wek rojnamegeran xwest ku li ser vê mijara ‘PKK pêş ve hatiye’ lêkolîn bikin û me der barê van gotinên PDK’ê de tu tişt nedît. Berevajiyê vê yekê; navçe û gundên ku PKK li wan ne heta niha tu nebaşî û xirabî derneketiye.  Ev xal gelek girîng in û hewce ye hay hemû kurdan ji van xalên girîng hebe.”





Xweşkanî

Felemez Ulug

## Şerê parastina berjewendiyan

Di vê dema ku çavê hemû civaka kurdan li yekitî û yekrêziya gelê kurd e, pêşveçûn û bûyerên li herêmê diqewimin berovajiyê vê heviyê bi pêş dikevin.

Partiya Demokratîk a Kurdistanê (PDK) ji bo di çerxa sermayedar û kapîtalîst de cihê xwe bigire, li dijî nirx û yekrêziya gelê kurd tevdigere. Ji bo hêviya gelê kurd a yekitiyê bi temamî ji holê rake çi ji destê wê tê dike.

Ev partiya ku bi dijminê gelê kurd re peymana hevkariyê îmze kiriye gelo dikare berjewendiyên gelê kurd biparêze. Çawa li Şengalê li dijî îradeya gelê herêmê bi dewleta tirk û rêvebiriya Bexdayê re di nav hevkariyê de ye, her wiha li bakur û rojhilatê Kurdistanê jî li dijî pergala rêveberiya xweser e.

Ji bo li van herêman gelê kurd bê îrade û bê maf bihêle çi ji destê wê tê dike. Bi peymana Bexdayê re aşkera dibe ku PDK li herêmê naxwaze gel bi îradeya xwe ya azad xwe birêxistin bike û xwedî li nirxên xwe derkeve. Lewma PDK naxwaze li herêmê têgeha azadiyê û xweîfadekirinê bi pêş bikeve.

Dixwaze gelê Şengalê mîna berê bê îrade û bê maf be ku bi her awayî muhtacî wê bibe. Ger gel muhtacî wê bibe wê bejna xwe li ber bitewînin û jê bitirsin. Ji ber ku PDK bi tu awayî nirx nade yekrêzî û îradeya gelan, bi temamî dixwaze hemû tişt li gor berjewendiyên wê bên rêxistinkirin û birêvebirin. Lewma li gor pergala ku piştî êrîşên DAIŞ’ê yên di sala 2014’an de li Şengalê hatiye avakirin PDK û aligirên wê negengaz e ku bikaribin xwe li herêmê bidin jiyîn û xwe li ser gel bidin ferzkirin. Ev jî bi temamî li dijî destkeftiyên wan e. Lewma ji bo vê pergalê têk bibin û dîsa herêmê ber bi tarîtî û kaosê ve bibin çi ji destê wan tê dikin.

Bêguman PDK ne tenê li Şengalê li rojavayê Kurdistanê jî dixwaze gelê kurd nebin xwedî destkeftiyên mezin. Bi destê çend xwefiroş û bêîradeyan li vê herêmê nahêle ku yekrêzî û yekitiya gel çêbibe.

Ji bo parastina destkeftiyên di berdêla xwîna bi hezaran ciwanên kurd de hatine bidestxistin, partî û rêxistinên rojavayê Kurdistanê her tim alîgirê diyalog û yekrêziya rêxistinên kurd bûne. Li vî parçeyê herî biçûk ê Kurdistanê PDK li pey lîstik û kiryarên mezin e. Ji bo pergala li herêmê hatiye avakirin têk bibe û li ber dilê neyarên gelê kurd xwe xweş bike çi ji destê wê û hevkarên wê tên dike.

Bêguman ev emelên PDK’ê ne ji xwe ne. Ev hemû li gor daxwaz û biryara dewleta tirk bi pêş dikevin. Bi taybetî êrîşên li ser rêveberiya rojavayê Kurdistanê, hevkariya PDK û dewleta tirk aşkera radixe ber çavan. Ji bo di vê mijarê de destê xwe xurt bike jî ji xwe re hin hevalbendên mîna xwe peyda kirine. Ev çend kesên ku xwe di bin navê ENKS’ê de li herêmê bi cih kirine di rastiya xwe de ew kesên li dijî destkeftiyên gelê kurd in.

Hevkariya van a bi PDK’ê û dewleta tirk re ji hêla hemû aliyên li ser mijarê xwedî agahî ne tê zanîn. Ev kesên ku bê îrade û xwefiroş ji bo di nav rêxistinên Rojava de yekrêzî çênebe çi ji destê wan tê dikin. Herî dawî li rojavayê Kurdistanê, xwestine pergala perwerdeya zimanê kurdî û hevserokatiyê bikin mijara bazarê. Kesên ku ne di ferqa wateya perwerdeya zimanê zikmakî de bin gelo dikarin ji bo azadiya civakekê têbikoşin? Ger azadiyê di ziman û xwe îfadekirinê de nabînin li gor wan gelo têgeha azadiyê çi ye?

Ev kesên ku ne di ferqa xetereya van daxwazan de ne gelo dikarin civakekê azad bikin? Ango amade ne ku ji bo azadiya civaka xwe bedel bidin? Naxêr, amade ne ku ji bo civakê tiştekî jî bikin. Mirovê bêîrade nikare îradeya gelekî temsîl bike û ji bo azadiya wê têbikoşe.

Heman têgeha ku ji navenda PDK’ê ve tê birêxistinkirin û rêvebirin niha ji bo dilê hevkarê xwe xweş bike berê xwe daye herêmên gerîla. Êrîşên li ser Şengal, Rojava, Mexmûr û Herêmên Parastinê yên Medyayê pêşdikevin ne ji xwe ne.

Çawa ku dewleta tirk dixwaze kurdê azad tune bike PDK jî dixwaze ji derveyî wê tu hêzên kurd li herêmê nebin xwedî îrade. Ger ji derveyî PDK’ê gelê kurd bikaribe xwe bi xwe bi rê ve bibe û li gor îradeya xwe ya azad xwe rêxistin bike wê demê PDK dê nikaribe wisa bijî . Ev jî ji bo berdewamkirina desthilatdariya wê metirsiyek mezin dide çêkirin. Lewma ji bo vê metirsiyê ji holê rake bi hemû hêza xwe êrîşî kurdê azad dike.

PDK bi hevkariya dewleta tirk û bi êrîşên li ser civaka kurd niyeta xwe ya şer aşkera kiriye lê hîn civaka kurd gotina xwe ya dawî ji PDK’ê re negotiye.

# ‘Ne Azerbeycan ne jî Ermenistanê qezenc kir’

Navenda Nûçeyan

Mijara Qerebaxê ya bûye sedema şer di navbera Azerbeycan û Ermenistanê de herî dawî di 27’ê îlonê de dest pê kiribû. Piştî 44 rojan jî di 9’ê mijdarê de Ermenistan û Azerbeycan bi navbeynkariya Rûsyayê agirbest îlan kirin. Ev peyman ji aliyê gelek derdoran ve wek têkçûna Ermenistanê hat şîrovekirin.

Der barê nêzîkatiyên civaka ermen de Hevserokê Yekitiya Rêxistinên Kurdî ya Navneteweyî ya li Rûsyayê Arif Ezmanî û Hevserokê Kurdistan Komîte ya Ermenistanê Silo Dirboyanî ji rojnameya me re axivîn.



Silo Dirboyanî



Arif Ezmanî

Arif Ezmanî diyar kir ku mijara Qerebaxê ne pirsgirêkek nû ye, ev 30 sal in didome û wiha got: “Dema Sovyet ber bi tevliheviyê ve çû destpêkê ermenên li Qerebaxê qala serxwebûnê kirin. Di sala 92’yan de jî ermenan 7 qezayên nêzî Qerebaxê bi dest xistin. Vê salê ermenan li Qerebaxê serxwebûna xwe îlan kirin. Yanê bi kurtasî ev 30 sal in ku ev mijara di navbera her du aliyan de hat cemidandin. Di nav van 30 salan de dewletan û Yekitiya Ewropayê serxwebûna Qerebaxê qebûl nekirin. Bi vî awayî statûya Qerebaxê bû mijara nîqaşan lê tu carî jî Ermenistanê ev yek qebûl nedikir.”

**Nêzîkatiya Rûsyayê**

Hevserokê Rêxistinên Kurdî Ezmanî bal kişand ser nêzîkatiya Rûsyayê ya şerê 27’ê îlonê dest pê kir û ev tiştê anî ziman: “Nêzîkatiya Rûsyayê em dikarin bi du beşan bigirin dest. Yek nêzîkbûna dewlet û saziyên wê û ya duyemîn jî nêzîkatiya civakê. Li Rûsyayê kesên navdar, pispor û partiyên komunîst piştgirî didan Ermenistanê û li hemberî polîtîkayên hikûmetê disekinîn û ev şer wekî yê Tirkiyeyê bi nav kirin. Em dikarin bêjin ku ev şer her çiqas hin qelsiyê Aliyev hebin û xwestibe bi vî şerî ji holê rake jî bi alîkariya Tirkiyeyê hat kirin. Li aliyê din jî serokwezîrê Ermenistanê Nîkol Paşînyan bi destê Amerîkayê hatibû ser rêveberiyê û helwesteke li dijî Rûsyayê bi aşkera Paşînyan ango hikûmeta Ermenistanê pêk dianî. Yanî berî vî şerî jî di navbera Rûsya û Ermenistanê de sarbûnek hebû.”

**Xetereya mezin**

Ezmanî diyar kir ku nêzîkatiya raya giştî li Rûsyayê hejmerak zêde piştgirî dane Ermenistanê û wiha got: “Hejmareke zêde ermen û azerî li Rûsyayê hene. Em dikarin bêjin li Rûsyayê raya giştî sempatiya wan ji bo ermenan hebû. Di ji sedî 80’yê tv û qenalên Rûsyayê de jî ev yek xuya dikir. Sedema vê yekê jî li vir gelek kes dibêjin ku Rûsya alîkarî nedaye Ermenistanê û ew tenê hiştin. Gelek kes nêzîkatiya Rûsyayê jî rexne kirin û bi gotinên ‘Tirkiyeyê çeteyên xwe anîn xistin nav Azerbeycanê ev yek jî dê di pêşerojê de bibe sedema pirsgirêkên herî mezin ên Rûsyayê.’ Armanca Tirkiyeyê ew e NATO’yeke tirkan ava bike û Qerebax jî tenê hincetek e. Ev yek jî ji bo pêşeroja Rûsyayê wek xetereyeke herî mezin tê dîtin.”



Hevserokê Yekitiya Rêxistinên Kurdî ya Navneteweyî ya li Rûsyayê Arif Ezmanî û Hevserokê Kurdistan Komîte ya Ermenistanê Silo Dirboyanî li ser rewşa Qerebaxê axivîn

**Nuqteyên qontrolê**

Di axaftina xwe de Ezmanî got ku Rûsya, di nuqteyên kontrolê de çavdêriya Tirkiyeyê tenê li Azerbeycanê qebûl dike li Qerebaxê qebûl nake û wiha domand: “Tirkiye dixwaze navenda xwe ya nuqteyên qontrolê li bajarê Şûşayê jî ava bike û bi vî awayî ermenan aciz bike. Çawa ku Tirkiye li Sûriyeyê bi Rûsyayê re derdikeve dewriyeyên leşkerî, dixwaze heman tiştî li Qerebaxê jî bike. Hem ji bo rûsan hem jî ji bo Qafqasyayê ketina tirkan li wir xetereyeke mezin e. Herkes dibêje dê Tirkiye çeteyên xwe li wir zêde bike.Tişta balkêş ew e ku serokê hêzên aştî yên Rûsyayê ku Qerebaxê biparêzin, azerî ye û ji Daxistanê ye.”

Hevserokê Kurdistan Komîte ya Ermenistanê Silo Dirboyanî ji diyar kir ku ev 30 sal in di navbera her du aliyan de diyalog hebûye lê di encamê de şer dest pê kir û wiha got: “Diyaloga heyî jî ji gel vedişartin û her du dewletan di navbera xwe de dixwestin hin deveran biguherînin. Yanî axaftinên heyî ne zelal bûn. Wê demê navê heft qezayan derbas dibû. Cihên ku niha şer li ser wan tê kirin di şerê sala 92-94’an de Ermenistan bi şer bi dest xistibûn.”

Silo Dirboyanî di axaftina xwe de bal kişand ser tevlîbûna Tirkiyeyê ya şer û wiha domand: “Di vê dema dawî de Tirkiye dît ku li Ermenistanê qelsî heye, xwest xeyalên xwe yên panîslamîzm û panturkîzmê pêk bîne. Bi vî awayî jî têkiliyên xwe bi Azerbeycanê re hîn xurtir kir. Helbet ne tenê Tirkiye, Brîtanya û Îsraîl jî di nav de heye. Bi kurtasî van hêzan nakokiyên di navbera Ermenistanê, Azerbeycan û Rûsyayê de dîtin û agir pêxistin.”

**Nerazîbûnên hin derdoran**

Dirboyanî destnîşan kir ku piştî îmzekirina peymana herî dawî li Ermenistanê protesto hatin kirin û wiha pê de çû: “Ev derdorên ku rabûn ser pêyan jî bi giştî alîgirên rêveberiya berê bûn û ji rêveberiya Paşînyan hesap dixwestin ku çima ev peyman îmze kiriye. Van derdoran jî digotin çima di serî de xwe ji Rûsyayê dûr xistiye û Paşinyan ketibû bin milê Amerîkayê û hwd.”

Her wiha Silo Dirboyanî diyar kir ku ne Azerbeycan ne jî Ermenistanê qezenc nekiriye û axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Ji ber ku gelên li Qerebaxê bi salan e bi hevdu re dijîn, tu problemek di navbera azerî û ermenan de tune bû û îro jî bo berjewendiyên dewletan, Qerebax bû cihê şer. Yanî ev şer ne yê gelan bû yê dewletan bû. Di encamê de her du gelan jî winda kir.”

# ‘Ger neguhere danekirin li ber derî ne’

Bêrîvan Kayi

Hilbijartina serokatiya Amerîkayê ya di 3’yê mijdarê de dest pê kir, heta 6’ê mehê berdewam kiribû. Hilbijartin ji hêla hemû cîhanê ve bi baldarî hat şopandin. Li gorî encamê nefermî 7’ê mijdarê namzetê Demokratan Joe Bîden bi 273 delegeyan bû serokê  Amerîkayê yê 46’emîn.

Piştî encamên hilbijartina DYA’yê em bi rojnameger Mutlu Çivîroglu re axivîn ku hilbijartina li Washgîngtonê ji nêz ve dişopîne. Çivîroglu têkildarî encamên hilbijartinê, ferqa dengan a di navbera Donald Trump û Joe Bîden û bandora serokatiya Bîden a li ser Rojhilata Navîn bi taybetî li ser kurdan nixandinên girîng kirin.

**Gelên Amerîkayê kêfxweş in**

Çîvîroglu diyar kir ku civaka Amerîkayê bi giştî ji ber  bidestxistina serokatiyê ya Joe Bîden dilşad in û wiha got: “Tê zanîn ku civaka Amerîkayê civakek dabeşkirî ye û em dikarin bêjin ku hema hemû eyalet bi serkeftina serokê 46’an ê Amerîkayê û serkeftina Kamala Harîsê ku cara yekem wek jineke reşik di rêveberiya Amerîkayê cih girtiye, şanaz in. Her çiqas ev encam ji aliyê Trump û alîgirên wî ve hê nehatibe qebûlkirin jî; em dikarin bêjin ku li hemû eyaletan kêfxweşiyeke mezin heye.”



**Vegera li polîtîkayên berê**

Çivîroglu têkildarî polîtîkayên bingehîn ên di navbera Bîden û Trump de jî got ku helbet dê cudatiyek hebe û ev nirxandin kir: “Siyaseta Trump ew bû ku xwe ji siyaseta derve vekişîne û bikişîne nav sînorên Amerîkayê. Yanî dixwest rola Amerîkayê ya globalî; ji hêla leşkerî, siyasî, dîplomatîk û aborî ve kêm bike û hemû derfetan bîne nav Amerîkayê. Ji ber vê yekê jî ji Netewe-yên Yekbûyî heta NATO’yê peywendiyên wî nebaş bûn. Di peymanên wek ên avhewayê de jî ev peywenda Trump li holê bû. Yanî wisa xuya dibe ku bi hatina Bîden dê Amerîka vegere ser polîtîkayên xwe yên berê. Hem ji aliyê aborî û siyasî, hem ji aliyê dîplomatîk û leşkerî ve dixwaze were ser rola xwe ya berê ku wek ‘mezinê malê’ dihat pênasekirin. Hem bi NATO û Yekitiya Ewropayê re hem bi hevalbendên xwe yên seranserê cîhanê re dixwaze têkiliyên xwe sererast bike.”

**Polîtîkayên Trump ên li ser kurdan**

Di berdewamê de Çivîroglu bal kişand ser polîtîkayên Bîden ên li ser Rojhilata Navîn bi taybetî yên li ser kurdan û wiha pê de çû: “Dema mirov li daxuyaniyên Bîden ên dawî yên der barê Tirkiye, Sûriye û Iraqê de bimeyzîne dê çarçoveya polîtîkayên Bîden derkeve holê. Bîden gelek caran li hemberî polîtîkayên serokomarê Tirkiyeyê daxuyaniyên pir tund dabûn û wek berpirsiyarê bûyerên herî xirab nîşan dabû. Bi taybetî kiryarên li hemberî kurdan gelek rexnekiribûn û helwestên Erdogan wek encamên helwestên Trump nîşan dabûn. Li Rojava û her wiha di êrîşên Tirkiyeyê yên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê de dema ku Trump hêzên leşkerî vekişandin, Bîden ew bi awayekî tund rexne kiribû û gotibû ku ‘em çima hevalbendên xwe bi tena serê xwe dihêlin û rê li Erdogan vedikin.’ Her wiha Bîden dixwest li Iraqê jî kurdên Herêma Kurdistanê xwediyê maf û nasnameya xwe bin. Helbet îhtîmaleke ku li Tirkiye, Sûriye û Iraqê ji bo kurdan hin derfet çêbibin. Li Washingtonê jî bendewariyeke bi vî rengî heye.”

**Îhtîmala peymana nukleerî**

Rojnameger Çîvîroglu bal kişand ser têkiliyên di navbera Îran-Amerîkayê de û wiha domand: “Bendewariya Îranê ew e ku careke din peymana nukleerî zindî bike û destê Îranê xurt bike. Demokrat hez dikin ku vegera peymana nukleerî hebe. Îhtîmal e ku ev peyman zindî bibe lê hewce ye mirov hinekî rastiyê bibîne ku Îran ji aliyê dewleta Amerîkayê ve wekî hêzeke neyar tê dîtin. Loma jî normalbûna peywendiyan hinekî zehmet xuya e lê bi giştî em dikarin bibêjin ku di tevahiya polîtîkayên Bîden de dê Amerîka li gorî rola xwe ya cîhanî û pêşengiya xwe tevbigere. Niha ev polîtîka li Washingtonê tên axaftin.”

**‘Em jî hevalê kurdan in’**

Çivîroglu da zanîn ku Bîden ji bo ku demeke dirêj senatorî kiriye ji cîhanê agahdar e, ji pirsgirêkên cîhanê bi taybetî ji pirsgirêka kurdan agahdar e û wiha got: “Tê zanîn ku ji ber Trump ne ji nav siyasetê hatibû dihat rexnekirin. Bîden berovajî vê yekê ji nav siyasetê hatiye û xwedî tecrube ye. Dema êrîşên li ser Serekaniyê, Girê Spî û Efrînê pêk hatibûn li Amerîkayê gelek reaksîyon çêbûbûn û Trump hatibû rexnekirin. Yek ji van rexnegiran Bîden û Harrîs bûn. Hewce ye mirov ji bîr neke ku peywendiyên her dewletekê li ser berjewendiyan dimeşin. Hem kurdên li Amerîkayê hem pisporên Rojhilata Navîn Bîden wekî ‘serokê piştgirê kurdan’ bi nav dikin. Bîden di 2001’î de dema ku diçe herêma Kurdistanê û dibêje ‘ne tenê çiya, em jî hevalê kurdan in’ û dema êrîşên li ser Rojava daxuyanî dabûn. Bi van mînakan pispor wêneyekî ku dê Bîden piştgiriyê bide kurdan derdixin holê.”



**Danekirin li ber derî ne**

Her wiha Çîvîroglu bal kişand ser têkiliyên Amerîka-Tirkiyeyê û diyar kir ku her çiqas Bîden bi awayekî tund polîtîkayên Tirkiyeyê rexne bike jî divê mirov hevalbendiya wan a dîrokî li ber çav bigire û wiha bi dawî kir: “Tirkiye û Amerîka ji bo hevdu girîng in lê di salên dawî de tiştên Tirkiyeyê kirine yek ji wan jî ji aliyê Amerîkayê ve nehatin pejirandin û tim bû mijarên nîqaşê. Heta kongreyê çend caran biryara danekirinan dabû lê tu carî ev ji aliyê Trump ve nehatibûn îmzekirin. Mijara kirîna S-400’an, têkiliyên Tirkiyeyê ya bi Rûsyayê re û hwd. kongre hem bi demokrat hem bi komargeran re hejmareke zêde li hember van bûyerên Tirkiyeyê sekinîn lê belê dîsa jî danekirin neketibûn dewrê. Îhtîmaleke mezin e ku ji aliyê Bîden ve têkevin meriyetê. Dibe ku mijara Încîrlikê ya her carê Tirkiye wekî çekê li hemberî Amerîkayê bi kar tîne were ser masê. Mijara Halkbankê li Amerîkayê ji aliyê gelek kesan ve tê ser ziman. Ger ji aliyê Tirkiyeyê ve guherînek çênebe îhtîmala mezin ew e ku danekirin li ber derî ne.”

# Berhemên ruhê xwebûnê-4

# Şêx Ubeydullahê Nehrî

Abdurrahman Sever

**Di tebaxa 1880'yî de serhildan dest pê dike. Bi fermandariya kurên Şêx Ubeydullah, di demeke kurt de bi hêsanî Ûrmiye, Sebleh û Mahabad tên rizgarkirin**

Xwêdan dilop bi dilop ji laşê Şêx diçû. Bi awayekî ji qesrê reviyabû û divê xwe bi lez û bez biavita keştiya fransiziyan a diçû Gurcistanê. Leşkerên Osmaniyan jî li her derê Stenbolê li pey Şêx bûn. Şêx bi dilq û bergên bazirganan û bi gavên mezin ve ber bi strîngehê ve diçû, carna jî baz dida. Li gor temenê xwe yê pencî salî meşeke ne xirab bû. Xwe biavita keştiyekê wê rehet bûbûna. Şêx ji gelek kolan û sûkan derbas bû û di dawiyê de xwe avêt strîngehê û wekî sekna bazirganên mezin li keştiya şîrketa fransiziyan a bi navê Pakê siwar bû. Xwêdana xwe paqij kir û cara dawiyê li Stenbolê mêze kir. Dixwest pir tiştan bibêje lê ne cihê wê bû. Dema keştî hêdî hêdî bi rê ket, Şêx berê xwe da Stenbolê û soza azadiya welatê xwe dubare kir. Piştre, li cihê xwe rûnişt, çavên xwe girtin û ket xewa şîrîn.

Di xewê de, pêvajoya serhildana wî wek filma sînemayê yek bi yek di ber çavên wî re derbas dibû. Zaroktiya wî, ciwantiya wî, şervantiya wî, fermandariya wî; ax, av û hewaya welatê wî yek bi yek dihatin ber çavên wî. Şêx Ubeydullah, berpirsiyariya dîrokê dabû ser milê xwe. Divê tevgera azadiya gel û welatê xwe ya dabû destpêkirin û nîvco mabû, bibira serî. Ne wisa bûna wê çawa xwe layiqê gel, welat û jiyana xwe ya giranbuha bidîta. Erê, rêya welêt dûr bû lê jiyan û bîraninên Şêx jî gelek dûr û kûr bûn.

Şêx Ubeydullahê Nehrî, di sala 1826'an de li Şemzînanê tê dinê. Ji terîqeta neqşebendî û kurê Seyid Tahayê Colemêrgî ye. Di serdemeke gelek zor û zehmet de tê dinê; li her derê cîhanê şer, talan, xizanî, girîn, koçberî heye. Gelê herêmê pirî caran ji ber êrîşên osmanî û îraniyan hildikişin û xwe dispêrin çiyayan. Xwe kom dikin û li dijî êrîşan şer dikin lê ji bo jiyaneke aram û azad ev têr nake. Serhildanên mezin jî çêdibin lê hema hema dawiya wan wekî hev, têkçûn e. Gelê kurd pirî caran bi hêza xwe sekneke mezin nîşan daye û rêveberiyeke xweser ava kiriye lê hikûmeta Osmaniyan çiqas paşve here û erdên xwe yên rojavayê welatê xwe ji dest bidin, ewqas bi ser kurdan û welatê wan de tên. Ew jî ne bes e, li aliyên din jî dewleta Îranê zext û zorê li kurdan dike. Her wiha zaroktî û ciwantiya Şêx tim û tim di nav gengeşî û aloziyan de derbas dibe.

Pêvajoya herba 93'yan (1877-1878) ji bo hilweşandina dewleta Osmaniyan dibe mîladek. Aboriya wan têk diçe lê hêza wan a lêşkerî hê jî heye. Piştî herba 93'yan di jiyana kurdan de jî parçebûn û xizanî derdikeve asteke bilind. Ji her alî ve di bin dagirkerî û zor û zehmetiyan de ne. Ji ber vê pêngaveke nû hewce ye. Ev pêvajoya hebûn û tunebûnê ye. Dîrok li benda pêşengê xwe ye.

Şêx Ubeydullah rojeke ji rojên zor û zehmet, li civateke mezin wiha dibêje: "Bêhêvî nebin, xwe bernedin, hevdu bigirin. Ji bîr nekin ku wexta reştariya şevê bêhnek beriya berbangê ye." Bi vê gotina xwe rol û rista xwe ya dîrokî ya pêşengiyê diyar dike û dest bi amedekariyê dike.

Şêx Ubeydullahê Nehrî, bi aqil, wêrekî û rêzdariya xwe hem di nav kurdan de him jî di nav welatên osmanî û îraniyan de xwedî rûmet û hezkirineke zêde ye. Ji aliyê zanista ol û siyasetê ve pêşketî û pêşengekî navdar e. Ji her deverên welêt, ji bo çareserkirina pirsgirêkan navnîşana gel e. Li gor nivîsa nivîskar Celîlê Celîl, ermenekî yê bi Şêx re hevaltî kiriye, ji bo Şêx wiha dibêje: "Şêx Ubeydullahê Nehrî, bi şiklê xwe yê fizîkî gelek bi heybet û di jiyan û kesayeta xwe de jî gelek dilnizm bû. Di her xalê de hêza çareseriyê bû. Ew nebûna pêşengê terîqetê jî ew rêberê gel ê xwezayî bû."

Erê, Şêx Ubeydullah, piştî têkçûna serhildanên kurên Mîr Bedirxanê Osman û Hisên, nêzî salekê tevahiya welêt û der û doran digere û bi taybetî jî hem bi serokên kurdên Îranê re hem jî mezinên kurdên rojava re tifaqên mezin dike. Bi pêşeng û rêberên ermen û suryanan re têkiliyên xwe xurt dike. Di sala 1880'yî de komcivîneke mezin li dar dixe. Em dikarin bibêjin ku di dîroka kurdistanê de komcivîna yekitiya giştî û hevgirtinê cara yekemîn li Şemzînanê û bi serokatiya Şêx Ubeydullahê Nehrî pêk tê. Di vê komcivînê de armanc û gelek biryar tê diyarkirin. Dê gav bi gav kiryarên nû dest pê bikin. Armanca Şêx a destpêkê bidestxistina bajarên kurdên li Îranê ye. Ji bo vê jî bajarên Mahabad û Ûrmiyeyê wek wargeh hildibijêre. Piştî rizgarkirina van bajaran dê serhildan berfireh bibe.

Di tebaxa 1880'yî de serhildan dest pê dike. Bi fermandariya kurên Şêx Ubeydullah ( Sadik û Seîd Evdilqadir) di demeke kurt de bi hêsanî Ûrmiye, Sebleh û Mahabad tên rizgarkirin. Jixwe gelên van bajaran ji Şêx pir hez dikin û dikarin ji bo wî her tiştên xwe feda bikin. Bi tevlêbûna gel gund û navçeyên der dorê jî ji hêzên îranî tên rizgarkirin. Heta metirsiya Şêx li ser bajarê Tebrîzê jî çêdibe.

Îngilîz ji pêşveçûna kurdan aciz dibin û alîkariyê didin osmanî û îraniyan. Hikûmeta rûsan jî ji bo piştgiriya Îranê leşker dişîne ser hêzên kurdan. Di heman demê de osmanî û îranî jî hevkariyê dikin û hikûmeta osmanî leşker dişîne sînoran û sînoran digire. Hinek serokên eşîrên kurd jî li ser evqas geşedanan ditirsin û paşve gav diavêjin. Êdî Şêx û hêzên wî di heman demê de li hemberî sê dewletan şer dikin. Hem li ser sînoran hem jî di nav bajaran de şerên pir mezin diqewimîn. Şêx neçar dimîne û xwe bi awayekî zor diavêje çiyayên Şemzînanê lê hêzên osmanî wî bernadin û desteser dikin û bi lez û bez dibin Stenbolê. Dema Şêx tînin Stenbolê bi hezaran hezkiriyên Şêx, li pêşiya qesra paşeyê Osmaniyan kom dibin û hezkirina xwe ya ji bo Şêx Ubeydullah tînin zimên. Paşa, bandora Şêx careke din dibîne û wî tîne qesra xwe dike mêvan û dixwaze Şêx pê re hevkariyê bike. Armanc û xeyala Şêx Ubeydullahê Nehrî zelal e; serxwebûna gelê kurd...

Nêzî salekê, jiyana şêx li vir derbas dibe. Sala 1882' yan di meha tîrmehê û cejna meha remezanê de, Şêx plana xwe ya salekê çêdike û ji qesrê direve. Xwe bi awayekî zehmet diavêje keştiyeke fransziyan û derbasî Potiya bajarê Gurcistanê dibe û ji vir jî derbasî Colemêrg û Şemzînanê dibe. Hê jî tîna germehiya serhildanê heye. Şêx, germegerm di demeke kurt de hêzeke mezin saz dike û serhildana nîvcomayî didomîne lê agahiya Osmaniyan ji her tiştî heye û plansaziyên xwe jî çêkirine û hêzên xwe li her derê bi cih kirine. Hê derneketiye rê, dikeve nav kemîna bêbextan û ji çar aliyan ve tê dorpêçkirin.

"Şeveke bixencer bû.
Celad li benda qurbanên xwe bûn.
Û haya qurbanan nebû, ji hilma mirinê.
Ya staaaar ya star! "

Ev ristên nivîskar Hemîd Dilbihar qey ji bo vê rojê hatibûn nivîsandin. Bêhna mirinê ketibû reştariya şevê. Vê rojê şerek pir mezin diqewime û Şêx Ubeydullahê Nehrî dîl dikeve. Demildest bi malbata xwe ve mişextê Hîcazê ji wir jî Mekeyê dibe. Di ser mişextiyê re hê zêde dem derbas nebûye, Şêx Ubeydullah bi êş, elem û jana azadiya welatê xwe nexweş dikeve û diçe ber dilovaniya xwe.

Şêx Ubeydullahê Nehrî, li pey xwe mîrateya berxwedêrî û têkoşînê dihêle. Kurê wî Sadiq di şerekî de bi giranî birîndar dibe û jiyana xwe ji dest dide. Dîsa kurê wî Seîd Evdilqadir Nehrî jî piştî salên dirêj tev li serhildana Şêx Seîd dibe û li pey Şêx Seîd tê îdamkirin. Di dawiya serhildanan de koça dawiyê hebe jî dîsa mirin nikare berxwedêriya kurdan biqedîne.





Necat Ayaz

# Li pêşiya me tofan heye!

Di 1598'an de Con O'Neillê welatparêz ku hemû jiyana wî bi têkoşîna li dijî kolonyalîzma îngilîzan derbas bûbû, di ber sikratê de van şîretan li kurê xwe dike:

"Eger zarokên min fêrî îngilîzî bibin, genim bajon an li Ulsterê xanî çêbikin, ez ê heqê xwe li wan helal nekim. Dema bi vî zimanî biaxivin, wê serê wan tevlihev bibe; dema genim bajon wê bêtir ji eslê xwe dûr bikevin û dema xanî çêbikin, wê di mala xwe de wekî xelkê bi îngilîzî diaxive bijîn. Bi vî awayî, ew ê bibin sebeb ku hêlîna wan ji aliyê bazekî ve bê hilweşandin."

Zarokên Con O'Neill, ji bo bi gotina bavê xwe bikin, çi ji dest hat kirin lê nifşê li dû wan hat bi gotina pêşiyên xwe nekirin. Nifşên nû bi bayê bezê fêrî îngilîzî bûn, dest bi çandiniya ji bo bazarê kirin û paşê li bajarên îngilîzîaxêvan bûn xwedî xanî. Ew fêrî zimanê îngilîzî bûn û di  meseleya ziman de li gorî pêdiviya jiyana modern tevgeriyan. Nifşên modern, siyaseta rizgariya neteweyî bi îngilîzî meşandin û bi têkoşîneke dijwar dagirkerên brîtanî ji welatê xwe qewirandin.

Tam di vê nuqteyê de divê em vê pirsa krîtîk bikin: Çawa têkoşîneke li dijî dagirkerekî dikare bi zimanê vî dagirkerî bê meşandin û ji vê jî wêdetir, ev têkoşîn çawa dikare bigihîje encamê?

Bersiva vê pirsê di dîroka realîteya Îrlandayê de veşartî ye. Nasnameya etnîk a Îrlandaya serhildêr, li ser 4 stûnên zexm hatibû damezrandin: Dîrokeke hevpar a kevn a xwedî gelek berhemên nivîskî, çandeke hevpar ku bi hilberîna berhemên edebî û hunerî her zindî hatibû hiştin, dêra katolîk û zimanê îrlandî.

Paşê, zimanê bêşens ji ber polîtîkayên giran ên asîmîlasyonê şikest û nasnameya neteweyî ma li ser sê stûnan. Faktoreke din a alîkariyê li zindîbûna nasnameyê dikir, pozîsyona cografîk a welêt bû. Îrlanda giravek e û lewma xwedî sînorên cografîk e. Ev jî derfetên înkarkirin û tunekirina nasnameya welêt ji destpêkê ve pûç dike. Lewma digel hilweşîna stûna ziman, her sê stûnên din û taybetiya cografîk kir ku nasnameya neteweyî ya vî welatî li ser piya bimîne. Lewma siyaseta giravê, bi saya vê rastiyê dikarîbû kolonyalîzma îngilîzî bi zimanê îngilîzî têk bibe.

Madem li Îrlandayê rewş wiha ye, gelo li bakurê Kurdistanê têkoşîna gelê kurd nikare bi tirkî bê meşandin?

Dema mirov her du kontekstan bide ber hev, bi hêsanî bersiva vê pirsê diyar dibe. Em nikarin qala dîrokeke xwe ya ku berhemeke wê hîn li ser piya ye bikin. Ji bilî vê, ne edebiyat û medyayeke me ya ku bi girseyî bê şopandin heye û ne sînorekî cografîk di navbera me û efendiyê me yê dagirker de heye. Her wiha, ne oleke me ya cuda û ne jî saziyeke me ye polîtîk heye ku di dîrokê de gel di bin banê xwe de kom kiribe. Lewma, ji bo nasnameya neteweyî ya kurdan yek stûnek tenê dimîne ku ew jî ziman e. Eger ziman jî ji dest biçe, êdî tu tiştekî din ku bikaribe kurdîtiyê wekî neteweyekê li ser piya bigire namîne.


Niha kurdî ku tekane sermiyana me ya neteweyî ye, bi lezeke pir mezin hildiweşe. Lewma, çawa ku li Îrlandayê jî pêk hat û zimanê qedîm ê welêt xist ber sikratê, li pêşiya me jî tofanek heye!

# Pîrê ma Seyît Riza

Meral Ozel

Şarê kurdî tarix ra heta roza ewroyîne zilmêdo pîl amo têrî. Zilmoke şarê kurdî dîyo na dîna ser o beno ke jû şarê bînî nêdîyo. Rûmetêci her tim bîyo hedefê quwetanê kolonyalistan û paştîdayoxanê înan.Terteleyê Dersîm kî nînan rayew o. No tertele zerîya şarê kurdî de hona jûdirvet o. Bi hazaran însonîpîl, qiz ameyî kistene. Bi hazaran surgunê sûkanê asîmîlasyon bî.

Seyîdo Kal, Seyît Riza, lazê xo û hevalê ci ke Xarpêt de pêguretîyaye bî. Emrê Seyît Rizayî kerd qijkek, yê lazê ci Rezik Wûşenî kî kerd girs.Sewa bazarê 15'ê Payizê peyenî-Mîjdare Seyît Riza, Reşik Wuşên, AlîyêMîrzê Silî, Findiqê Qemerî, Hesenê Îbrayîmê Qijî, Hesenê Cibrayîlî,Wusênê Sêydî 15ê asma payîzê peyenî, Xarpêt de meydanê genîmî de destasodirî de ameyî dardekerdene. Naye ra tepiya kî qirkerdena ke serê şarî deameya ramitene nêqedîyaye. Heta roza ewroyîne ke bi plananê ciya bi ciya honakurdî yenê qirkerdene, kistene. Hona ziwan ra heta kultur tewayêdekurdan nêamo naskerdene. Dersîm de kî tewa nêvûrîya. Terteleyî ra dimagurenayisê asîmîlasyonî bi leze dest kerd ci. Ewro kî hem hetî zon,zagon ra hem kî hetê îtîqatî ra Dersîm de hardê qehramanan, hardêxoverdayoxan de tofanêda pîle esta.



Hona hurendiya mezelê Seyît Rizayî û hevalanê ci nêna zanayene. Dewleteeskera nêkena. Çinay rê hurendiya mezalan nêna eskera kerdene? Çik ratersenê? Ma zanîme ke dismenê însanîye, dismenê azadîye meyitan ramezelanê înan ra kî tersenê. Zanenê ke înan ke sarre verba zulumkarande çewt nêkerdo tim omid danê şarê xo. Coka ke mezelanê rayveran eskeranêkenê. Nîya wazenê ke qom înan xo vîr ra bikero. Nêyaro xo vîr. Sarreberzîna înan hetê kesî ra nêro zanayene.

Serranê 1937-1938 Tertelê Dersîm ra heta roza ewroyîne ser kamayis ûîtîqatê qomî de çarçeweyê Planê Şark Islahatî de qirkerdene bêmavêndewam kena. Heta ke azadî nêameye nê herîşî ke nêvindenê. Seyît Rizayî ûhevalanê ey sarrê xo dûstê zulumkaran de çewt nêkerd. No kî bî derdêqirkerdoxan. Se kenê wa bikerî tarix, namê xoverdayoxan, namêqehremanan nusneno. Coka yeno vatis; çik beno wa bibo, çiqas giran okî weşiya tewr rinde weşiyêda serbesta.

# Vayê Biden ê Amerîka do kêy bireso Kurdistan?



Mahir Uzmez

3ê Teşrîna Peyêne de weçînitişê Amerîka hamey viraştiş. Goreyê netîceyê nêfermî Joe Biden 290 hebî delegan reyde weçînitişê 2020an de bî serekê Amerîka yî. 4 serrî yê vernîya ma de Biden û cîgera xo Kamala Harrîs Amerîka do îdare bikerê.

Eno netîce suprîz nêbî. Xora verê weçînitişî zî hema hema hemekes paweyê eno netîce bî.

Hem şarê Amerîka hem zî şarê dinya polîtîkaya Trumpî reyde ande eciz bîbî ke şîyayişê cê semedê şaran yew vayo erenî estirna, labelê eno wa semedê taynan zî bî sedemê bêhoynî.

Trump bi sîyasetê xo Rojhilato Mîyanî kerd sey cehenim. Yew cayra vernîya dagirkerîya erdanê Rojavanî akerd, cayo binra zî destek da dişminê şaran.

Ma sîyasetê Trumpî taybetî ê verva şarê Kurdî nizdîra şinasne nê. Trump sey yew çerçî, kura de menfeatê ci bî (taybetî menfeatî şexsî) xo antînêne ay kinar. Eno sîyasetê ci bî sedemî Serêkanî yê, Grê Sipî heta bi sedemê Efrînê zî...

Trump tena rayirê dagirkerdişê nê sukan nêakerd. Destekdayişê sîyasetê AKP-MHPyî tena Rojava yê Kurdistan nê, Başûr û Bakûrê Kurdistanî û heme muxalefetê Tirkîya bênefes verda.

Verva çimanê dinya de rejimê Erdoganî bi ardimîya Trumpî resa eno rojan. Kala temam kê Trump ra wanê... Coka ez nê wazena vêşî derg bika, şîyayişê Trumpî semedê ma Kurdan yew karo xeyrin o.

Hameyişê Bidenî taybetî ma Kurdan rê çi bîyaro?

Enka mijara ma ya sereke ena ya. Trump şî, ma yew nefeso rehet girot la enkara pey do se bibo?

Cewabê eno pirsî kampanyaya Biden ê limita de yo.

Biden yew sîyasetmedaro xurt o. Emrê ci mîyanê sîyaset taybetî zî sîyasetê teber yê Amerîka de viyarto. Hem pirsgirêka Tirkîya, hem pirsgirêka Kurd û hem zî temamîya Rojhilatî rind şinasneno.

Kampanya Weçînitişî de Biden eşkera Erdoganî ra vat bî "Ti Otokrat î" û dewamîya qalanê xo de va 'Lazimo ma verva Erdoganî muxalefetê Tirkîya destek bikê û vernîya sîyasetê Kurdan zî akerê...' Reyna Biden wextê kampanyaya weçînitişî de soz da û va 'Hem mesela qatliyamê Armenîyan bişinasno hem zî mesela behra sipî û hem zî mesela s-400 yan hal bike.'

Enka şarê Kurd û muxalefetê Tirkîya paweyê Biden ê ke Biden binê enê qalan deko û vatişê xo pratikt de kar bîyaro. Biden wazeno eno sozê xo ca bîyoro yan zî ca nêaro, rayna zî çand tenî estî ke enkera bê hewn mendî.

Seke şima zî nizdîra zanê, tayn dewayê dewleta tirkî mehkemê Amerîka de sira xo pawenê. Dewayê sey "Halk Bank", dewaya sey petrolê DAIŞî...

Trump verva Tirkîya enê dewayan kerdbî mijara ticarî. Coka rayirdoxê dewleta tirkî wextê Trumpî de rehet bî.

Coka hameyişê Bidenî hewnê tayn kesan herimneno. Ay kesê ke hewnê înan herimîyayo ra yew zî James Jeffry û yewna bin zî Berrat Albayrak o.

Eno herimîyayişê hewn verê serrê James Jeffrey werd. Hema weçînitiş tam nêqedîyabî Jeffry îstifa kerd. Jeffry terafê Trump ra Sûrîya de hameybî wezîfekerdiş. Wextê Jeffry de Sûrîye de taybetî bi destê çetayan qatlîyam, dest dergkerdiş, tecawuz, remnayîşê cenî û gedeyan zaf vêşî bibî. Eno sucê giran Jeffry bê Trumpî teyna serrê xo nêeşkayêne hewano. Coka rojêk eşkere bî ke Trump şono, Jeffry zî îstifa kerd.

Jeffry ra pey yew xebera îstifayî zî Anqara ra hamey. Wezîrê aborîya tirkî Berrat Albayrak îstifa kerd. Heya enka yew îstifakerdina Albayrakî eşkera bi weçînitişê Amerîka reyde gir nêdayo. Labelê sebebê eno îstifa zî eşkere bî ke hameyişê Biden re girêdayeyo.

Vernîya nuştoyê ma de bahsê dewayan û bahsê kirişnayîşê petrolê DAIŞî kerdibî. Yeno vatiş ke ekibê Bidenî peynîya enê meselan nêverdano. Coka Erdogan wazeno enkera bi enê tedbîran vernîya Biden bigîro.

Enê meselê û hema zaf meselê binî zî ana haseno, vayo ke Biden Amerîka estêrneno hamo dormarê Kurdistanî resayo. Hele ma boynî rojê vernîya ma de eno va do bibo tofan yan zî bibo wesar!




## Dewey Ma



Cemîl Oguz

cemilo@diyarname.com

# Cotkar-karker beno rewşenbîr?

Twîtter de henî tenan "tag" kerd bî a û tede waştê Wezaretê Perwerdehî yê Tirkîya mamosteyanê kurdan bigîro kar. Semedo tag biko rojev lazim o zehf twîtî bêrê vilakerdiş. Zehf tenî hema çî nisnenê û bi etîket kenê vila. Mi zî qeybî paştîdayînê înan çend twîtî nuştî. Ê twîtan de hîkaye bibî, ma ê hîkayeyan tîya de bi ziwanêkê bînî bikerê vila.

Mi va: Mamoste
Va: Belê
Mi va: Ez wazena çîke vacî
Va: Vace
Mi va: Ez nêvana.
Ê serê xo şa tê, la çîke nêva.
**
Ser o çend deqey derbas bî. Reyna mi verê xo da ê û mi va:
- Mamoste
Va: Belê
Mi va: Nê
Va: Nê çi yo?
Mi va: Ti hema nêzanê nê çi yo?
Sek reyna biwazo hêrs bibo, fekê xo de kerd miremir, la çî nêva.
**
Sero henî derbas bî, reyna ez nêvinderta û mi va:
- Mamoste
Va: Nawey se bî?
Mi va: Ti Şengul Ogurî nas kenê?
Va: Nê.
Mi va: Oho, ti hema ê nas nêkenê ti go senî ders bidê ma?!
Ro weşê ci nêşi, vindert la çîke nêva.
**


Şengul Ogur nuştoxêde kurdan o. O Mêrdîn ra yo. Deméko derg diyarname.com de quncik nuşt. Re rey qeybî rojnameyê Xwebûnî zî nuseno. Merdim eşkeno vaco o anarşîst o. Kitabêde ey bi nameyê "Şikêr" Weşanê Aram ra vecîyayo. Şengul Ogur serê meselay kurdî, têkoşînê kurdan û bîrdozî de zehf fikirêno, sereyê xo decneno.

**

Çende rocî verî xeberêk bîbî, tede vatêne "194 rewşenbîranê kurdan eşkerayî da". Muhîm nîyo eşkerayî serê çi de yo... Ya muhîm meseleya "Rewşenbîrî" ya. Ez aciz nêbîya, ju bi ju ez ewnawa nameyanê ke binê eşkerayî de îmzayî înan estê. Verê nameyê heminan de "karê" înan nuştebî: "Karker, terzî, karmend, hostay traktoran, cotkar, esnaf"... Helbet her însan muhîm o, la her însan eşkeno bibo rewşenbîr? Enî însanê enî karan kenê "rewşenbîr" ê? Yanê her keso ke karêk bikero beno rewşenbîr? Ger beno, ka vacê senî beno?

Eya ma Şengul Ogurî nas kenê. Ma zanê se keno, se nêkeno. Wayîrê kitabêk o. Eşkeno îmzay xo berzo binê zehf eşkerayîyan. La karker, terzî, karmend, cotkar senî benê rewşenbîr? Merdimê zey Şengul Ogurî nêftarenê xo ra vacê rewşenbîr, ê merdimî çawey eşkenê xo ra vacê rewşenbîr û eşkerayîyêka bi namey "Rewşenbîr" vila bikerê?

Egir ma vacin şima rewşenbîr niyê go eyb bo? Yan zî ger ma vacin wa ê "194 rewşenbîrî" şorê verê destê Şengul Ogurî de derse bigîrê, wa bimûsê dinya se bena, sera şina gelo go eyb bo?




# Me li beroşê da!

Rojek beriya 15 tebaxê tîma şivanan ji bo hemû kesan bizin amade kiribûn. Her kes wê rojê çûbû li gorî hejmara xwe bizin girtibûn. Hinekan li gorî hejmara xwe du, hinekan sê hinekan jî bizinek ji xwe re anîbûn.

Tîma Cahîd ji deh kesan pêk dihat. Li gorî hejmara wan bizinek para wan ketibû û têrî wan jî dikir. Cahîd ji bo bizin girtinê Dogan û Salar peywirdar kiribûn. Dogan û Salar piştî taştê, ber bi tîma şivanan ve bi rê ketin; çûn û hatina wan derdora çar saet û nîv diajot. Ji ber ku anîna bizinan pir zehmet bû, nêzîkî şeş seatan kişandibû.

Dogan û Salar ji ber inyata bizinê gelek westiyabûn. Dema vegerê Dogan digot: "Ev nêzîkî çar sal in, min hûr û serûpê nexwarine. Gelekî dilê min diçê, ez ê ji we re çêbikim." Salar jî got: "Erê wele min jî ji zû ve ye nexwariye. Dayika min jî gelek xweş çêdikir."

Piştî her du gihîştin tîmê, bizin girêdan ji bo ku roja din serjê bikin. Roja din Cahîd û yên din divê biçûna pîrozbahiyê. Serê sibê tîm rabû û wan bizina xwe serjê kir. Dogan hûr û piyên bizinê baş şûştin û kirin beroşeke biçûk û got wê piştî pîrozbahiyê wan çêbike. Tenê dê Salarê ji Rojhilat ji tîmê li wir bimaya, ji ber ku wê rojê aşpêj ew bû. Dogan ji Salar re got, dema em hatin ez ê çêbikim. Salar jê re got: "Hevalê Dogan min duh jî got, dayika min gelek xweş çêdikir, ez jî jê fêr bûm. Dixwazî heya hûn bên ez ji were çêbikim."

Dema Salar wisa got, Dogan jî jê re got: "Madem tu wisa dibêjî de hema çêbike. Li mitbexê cahterî û îsota hişk jî heye, têra xwe bavêje navê, bila piçek tûj be." Dogan got, ew karê min e jixwe em rojhilatî gelek ji tûjahiyê hez dikin.

Piştî wî Cahîd, Dogan û hevalên din ketin rê û çûn. Salar piştî nîvro ji bo xwarina êvarê nîvê goştê bizina xwe kir beroşa mezin û sor kir. Piştî birincê xwe çêkir, vêca dest bi çêkirina hûr û pepikan kir lê pirsgirekek Salar hebû ku wî tu carî hûr û pepik çênekiribûn lê dîsa jî got tiştek nabe xwarin goşt û birinc e kes birçî namîne. Salar beroşa xwe ya biçûk anî û da ser agirê êzingan. Piştre rûnê xwe berda beroşê, dema rûnê wî sor bû îcar hûrê ku amede kiribû berda beroşê û li hev xist.

Cihê ku tîm lê bû geliyek zêde ne kûr bû, kaniyek mezin tê de hebû. Pîrozbahiya 15'ê Tebaxê xilas bû. Cahîd, Dogan û hevalên din dema xwe berdan gelî, êdî ber bi êvarê bû. Hinek din berjêr bûn ku bêhneke tûj bi ser gelî ketiye. Dogan li Cahîd meyze kir û kir ofînî. Cahîd got çi bû? Dogan bi xemgînî got me li beroşe da!

Dema tîm nêzî mitbexê bû, Dogan lez kir ket mitbexê, dît ku di destê Salar de heskek û hûr û pepikên bûne kizot li hev dixe. Dogan êdî bi acizî got Salar te çi kir, te ew kirine kizot, ev bû te digot dayika min gelek xweş çêdike. Salar dizanibû xwarina xwarin herimandiye lê bi awayekî ji xwe bawer got: "Li seranserê Rojhilat wiha tê çêkirin. Ma ev çi ye, te hê kutilkên dayika min nedîtine." ***Heval Mistê***

# Tiştanok (mamik)



Me dîsa ji we re çend tiştanok ango mamikên xweş amade kirine. Em bi hêvî ne ku li gorî dilê we bin. Bi malbatî dîsa van mamikan ji hev bipirsin û tasekê ji kaniya da û dapîran, bav û bapîran vexwin. Bêguman tiştanok bi gotina 'kî dizane ev çi ye' yan jî bi 'mamê mino mamanî' dest pê dike.

**1-** Mêzera siltanî
Ji xwedê pê ve tu kesî nizanî
kî dizane ev çi ye?

**2-** Mamê mino mamanî
Ji zikê diya xwe derdikeve
Pişta bavê xwe dixurîne

**3-** Mamê mino mamanî
Yê difiroşe li xwe nake
Yê li xwe dike
nabîne

**Bersivên me ev in:**

**1-** Jina ducanî
**2-** Niftik, kibrît
**3-** Kefen

# Zûgotinok

Îro dîsa di tûrikê me de çend zûgotinok hene û em ê dîsa bi we hêjayan re parve bikin.

De werin em dest pê bikin û pirsa xwe ya her tim bipirsin.


→ Gelo kî dikare 3 caran li pey hev bêje:
**Çil heb derzî**
**Derzî bi derzî**
**Di qulka derziya diya min re bezî**

→ Heke nikaribî wê bêjî ka vê biceribîne:
**Deling di ling de**
**Ling di deling de**
**De bigere di nava gund de**

→ Heke ew jî nebû dê sedî sed ev çêbibe:
**Dest davêjimê, dev davêjê**



# XAÇEPIRS




**JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ**

1. Hiş, her wiha çala avê 3. Serok an jî serkêşê mîrtiyan
5. Zelal, paqij 6. Nexweşiya ku mirov ji sermê digire
7. Bajar, her wiha destmala ku berê jinan li serê xwe digerand
9. Kesên li bajaran dijîn 12. Nîşandan, şanîkirin 14. Cejin
15. Kesê bi kîn û înad 17. Vexwarina sereke ya ku her kes her roj vedixwe
18. Noteke muzîkê 22. Çiyayekî li bakurê Kurdistanê

**JI JOR BER BI JÊR**

1. Par, behre, qisim
2. Şikbirin, texmîn
3. Sewaleke ku ji bo şîr, goşt û hiriya wê tê xwedîkirin 4. Ser û çav
5. Kesên bê dê û bav dimînin
7. Çekdarên ku bergiriya welatê xwe dikin
8. Bez, bazdan û xwevekişîn
10. Arvan
11. Heywanekî ku bi fen û fûtên xwe tê naskirin 13. Ar
14. Limêj û rojî û hwd.
16. Mektûb
19. Ax, cihê ku mirov li ser dimeşe
20. Geş û seyran
21. Dîn
23. Cînavkeke pirsiyariyê

Bersiva hefteya borî



# Weşanxaneya NA'yê pirtûka helbestên Sohrab Sepehrî çap kir

Navenda Nûçeyan

Weşanxaneya NA'yê heşt berhemên hostayê helbesta Îranê Sohrab Sepehrî bi hev re çap kir û pêşkêşî xwendevanên kurd kir. Sohrap Sepehrî, helbestvan, nivîskar û wênesazekî îranî ye. Sepehrî yek ji serkêşê helbesta nûjen a Îranê ye û helbestên wî îngilîzî, fransî, spanî û îtalî jî di nav de, li gelek zimanan hatine wergerandin.

Pirtûka ku wergera wê Muhsîn Ozdemir kiriye ji 312 rûpalan pêk tê. Heşt berhêmên Sohrab di pirtûka bi navê 'Sohrab Sepehrî - Hemû Helbest' de derket.

**Jiyan û helbesta Sohrab Sepehrî**

Sohrab Sepehrî, di 7'ê cotmeha 1928'an de li gundê Kaşanê yê bi ser Îsfehanê ve hatiye dinê.

Sepehrî di helbestên xwe de, weke hin helbestvanên îranî yên weke Mehdî Exavansalis, Furûx Feroxzad û Ehmed Şamlû, siyaset nekiriye mijar. Ew, têgeha "jiyan" ê ya di rêya wê de şer, pevçûn, bawerî, bîrdozî û tevlihevî diqewimin bêwate dibîne. Jiyan ji bo wî ne xuyanek e. Di helbesta xwe de, jiyanê bi zimanekî sivik dişibîne "gezkirina sêvekê". Jiyan di hizra wî de vebîr e;

*jiyan ne tişt e ku, di keviya dolaba kevneşopiyê de*
*Ji bîra min û te biçe.*


Li gorî wî jiyan weke gelek tiştên xwezayê xwerû ye. Dema ku ji jiyana nûjen a bajaran aciz dibû, termûsê xwe yê çayê dixiste boxçika xwe û ber bi kaş û qelaç û çiyayan ve hildikişiya. Li wê derê li stranên çivîk, giya û bayê guhdarî dikir.

Helbestên Sohrabî, li gel vehewandina tenêtiyeke kambax, her tim jiyaneke di xweşikahiya zarokekî de teswîr dike. Di helbestên wî de, têgeha jiyanê:

*jiyan tiştekî wek taviyên barana cejnê,*
*û çinareke tije ji teyrikên reşêleyê bû*
*jiyan wê demê wek ronî û rêzên pêlîstokan bû*
*himbêzek azadî bû*
*jiyan di wê demê de hewza musîkî bû*

***Sirûda Jehrê***
*Dimêjim çiçikên şevê*
*Û li pey rengê bi efsûna laşî negemirî*
*Çavên te yên tije xwelî bi nêrîna xwe vedikolim*
*Li pey tunebûna min ji mêjve ye*
*Jehrê dirijîne rehikan ev efsûna bêar bi xwe*
*Heta ku wê têkelî şîr bike…*


***Dojeha Serberdayî***
*Min şev vexwariye*
*Û li ser van şaxên şikestî digrîm*
*Min bi tenê bihêle*
*Ey çavê tagirtî yê serberdayî*
*Min bi jana bûyînê re bi tenê bihêle*
*Nehêle ez xewa bedena xwe per per bikim*




*Nehêle ez ji balîvê tarî yê tenêtiyê serê xwe rakim*
*Û bi dawa bê esl û esas a xewnan ve hilawêsim .......*

**Wergerên Muhsîn Ozdemîr**

Ji bilî vê wergerê nivîskar Muhsîn Ozdemîr gelek berhemên din ji zaravayên din ên kurdî wergerandine kurmanciyê. Wekî helbestên Furûx Feroxzad û romana Sadiq Hidayet ji farisî û helbestên Şêrko Bêkes û şanoya Şanoya Dayika Niştiman ji soranî wergerandine kurmanciyê.




# Lîlav, 'zexel' û Weysel Tirpan

Dilbirîn Dilo

Niha di dest min de pirtûkek heye ku tiştinên ji temamê jiyanê di naveroka xwe de dihebîne. Mîna ku nivîskarê vê pirtûkê di çîrokeke xwe de behs dike ;

-Ez li pirtûkekê digerim.

- Yeka çawa?

- Bila tê de evîn hebe, şer hebe, kuştin hebe, îxanet hebe, jin hebe, dawet hebe, zilamekî qeşeng hebe, desmal di dest de bila bibe sergovend tew, tew, tew, kî zava, kî paşa ...

-Belê. Qasekî bisekine, ez ê binivîsim û bînim...

Erê erê behsa 'Lîlav'a Weysel Tirpan dikim. Bi rastî jî wî ev pirtûk bi xwesteka xwendevan nivîsaiye û aniye. Tê de her tiştê jiyanê heye.

Pirtûk di sala 2016'an de ji weşanên Avestayê derçûye û ji 148 çîrokan pêk tê. Bi piranî çîrokên li min bandor kirin, çîrokên xerîbiyê bûn; çîrokên nîvcomayî û çîrokên ji welatê xwe dûr ketî.

Dema min ev pirtûk xwend, bi hin çîrokan keniyam. Min nedixwest çîrok biqede. Bi hin çîrokan giriyam û min şikir kir ku çîrok ewqas kurt in. Pirtûk qediya lê çîrokên wê hê jî di hişê min de govendê digirin. Gav min dikenînin, gav min xemgîn dikin lê tim û tim min didin ramandin. Erê erê, lehengên vê pirtûkê em in, nas û dostên me ne û yên ji me dûrketî ne.

Weysel Tirpan bi vê berhema xwe bûye mînakek ji bo edebiyata cîhanê. Çimkî kurteçîrokên wî pir kurt in, heta pirên wan ji yek hevokekê pêk tên. Nizanim, belkî mîna ku dîsa nivîskar di çîrokek xwe de gotiye, ji tirsa mirinê ye ku wisa kurt nivîsiye.

Çîrokeke wî heye ji xeynî sernavê wê tu tiştek nîn e lê peyamek pir watedar tê de heye. Navê çîrokê 'Zexel' e. Nivîskar ji xeynî vê peyvê tu tişt nenivîsiye, yanî bi peyvek behsa çîroka temamê zexeliyan dike. Belkî jî westandin e ew lê ji bo min pir watedar bû.

Tirpan tenê bi nivîsa vê peyvê dixwaze bi xwendevan bide nîşandan ku zexelî, tiralî ew e ku mirov naxwaze/nikare tu tişt bike.Gelo ew tiştên ku vê jiyanê bi me dide jiyandin ango me dike dîlê jînê, zexelî ye an tirsa ji zexeliyê ye? Yanî ji ber ku tu tiştek ku em bikin tune loma em dijîn an em naxwazin teqawit bibin loma em dijîn? Bixwînin û biramin...

# Hejmara 11'an a Psychology Kurdî derket

Navenda Nûçeyan




Hejmara nû ya kovara Psychology Kurdî bi dosyaya 'koçberî û derûniya koçberiyê' derket. Bi hevpeyvîn û nivîsên curbicur li ser vê mijara girîng sekiniye.

Nivîs û mijarên vê hejmarê ev in: Prof. Dr. Jan Îlhan Kizilhan bi nivîsa xwe ya 'Psîkoterapî di Civaka Pir-çandî de' behsa koçberî û qonaxên koçberiyê, pevçûnên nifşî û nasnameyê, di peywenda navçandî de dermankirina psîkoterapî dike.

Prof. Dr. Renos Papadopoulos bi nivîsa xwe ya "Tûrikê Koçberiyê" ku Leyla Turhan ji îngilîzî wergerandiye li ser malê, jidestçûna malê, nasname û travma û pêşketina aktîvasyona zehmetiyan disekine.

Ûsiv Biyanî bi Psîkyatrîst Dr. Azad Dildar re li ser têgeha koçberiyê, bandora wê ya derûnî, şîn û jidestçûnên koçberan, nasname, xerîbî û nexweşiyên derûnî yên koçberiyê hevpeyvîn kiriye.

Derûnnas Berîtan Guneş bi nivîsa Zayend, Zayendî, Nasnameya Zayenda Civakî, Meylên Zayendî; Ferdên LGBT'î; Pispora Xizmeta Civakî Gulperî Gunduz, bi nivîsa "Xizmeta Civakî ya Psîkyatrîk" tê de cih digirin.

Kovar 4 sal in ji aliyê weşanxaneya J&J'yê ve dihat çapkirin. Hêjayê gotinê ye ku wê êdî weşanxaneya Avestayê kovarê çap bike.




# Li Germiyanê şanoya 'Firîn' hat pêşkêşkirin

Li Germiyanê ji aliyê koma şanoyê ya bi navê Gudu ve şanoya bi navê 'Firîn' hat pêşkêşkirin. Şano li ser pirsgirêkên civakî û astengiyên li ber ferdên civakê ye.

Di saetên êvarê de li Hola Hunerî ya navçeya Kelar a navenda îdareya Germiyanê, bi hevkariya Rêveberiya Giştî ya Rewşenbîrî û Hunerî ya Germiyanê şanoya 'Firîn di nav xulemêşê de' hat pêşkêşkirin. Seneryayo şanoyê ji aliyê Dastan Berzan û Goran Namiq ve hatiye nivîsîn.

Hêjayî gotinê ye şanoya 'Firîn di nav xulemêşê de' beriya niha li Silêmaniyê heft rojan hatibû pêşkêşkirin. Şano dê li Germiyanê jî du rojan were pêşkêşkirin.

Ji ber qeyrana darayî û şewba vîrûsa koronayê, nêzî salekê ye salonên şanoyan girtîbûn. ***SILÊMANÎ***




# 'Folklora me' gihişt xwînerên xwe

Navenda Nûçeyan

Kovara Folkora Me ji 3 mehan carekê ji hêla Weqfa Mezopotamyayê ve der barê folklora kurdî de bi edîtoriya Eşref Keydanî tê weşandin. Di vê hejmara nû ya kovarê de cardin ji gelek herêman berhemên berhevkariyê yên folklorî hatine weşandin.

Di hejmara nû de, Fatma Şahîn bi nivîsa xwe ya bi navê 'Ferhenga tematîk a hasil û mitbexê' (bajarê Agiriyê), Eşref Keydanî bi navê 'Du hîkayet ji herêma Garisanê', Beroj Mukriyanî bi navê 'Hin gotinên pêşiyan ji Anatoliya navîn' û Hêmin Omar Ahmad bi nivîsa 'Giftûgoya Mîrê Bota û Axaokê Bêdarî (ji arşîva a Ebdulreqîb Yûsifî) cih digirin.

Hîkmet Yildiz, Aydin Batur, Kurdjan Sorî û Elîf Gunê jî çend çîrokên ji herêma xwe nivîsîne. Mahîr Ugur çîroka Papûkê nivîsandiye, Mehmet Yildirim çakar bi nivîsa 'Qaydeyê xerîbiyê ji Qelqeliyê', Vildan Sevîm û Surya Humanê bi du zaravayên cuda dimilkî û kurmancî çîrokên rovî berhev kirine.

Her wiha hin nivîsên dewama nivîsên hefteya berê jî hene ku yek ji wan 'Biwêjên gundê Çîçikayê-2 ya Bêrîvan Matyar û nivîsa Ferhengoka Agiriyê-3 ya Firat Keklîk e.

xwebûn

16-22 Mijdar 2020 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 4 TL Hejmar: 48

*İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:* Kadri Esen
*Sorumlu Yazıişleri Müdürü:* İdris Gürmez
*Yayın Danışma Kurulu:* Abdulla Peşêw
Ehmed Huseynî
Kakşar Oremar
Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev
Selîm Temo
Dr. Zerdeşt Haco
*Yayın Türü:* Haftalık Yaygın Süreli
*Yönetim Yeri:* Kooperatifler Mahallesi Cahit Sıtkı Tarancı Sokak İstanbul Apartmanı No: 18/6 *Yenişehir / Diyarbakır*
*Baskı:* Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı *Bağlar / Diyarbakır*

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji bo abonetiyê
Tel:0 (541) 806 84 85

# Ew milkê kurdan bi xêr û bêr e



Keştiya Alalû
Agît Yazar



Te dît dinya ye; rojekê derfeta we çêbû û we xwest li welatê xwe yê şîrîn bigerin, teqez bila sewta strana Seîd Axayê Cizîrî ya "Ew milkê kurdan tev bi xêr û bêr e/alîk mahden e, tev zîv û zêr e/..." ji teyiba erebeya we kêm nebe. Em jî wer dikin; dengê awaza Seîd Axayê Cizîrî, ji hoperlora tomofîla me berz dibe û rê ji ber me diqelişe!...

Vê carê em li ser şopa lanên hesin, ên Xaltî-Ûrartûyan e; lanên hesin ên li derdora Xarpêt û Dêrsimê. Ne îşê henekan e! Cara ewil pêşiyên me Xaltiyan, hesin li vê axê kişif kirin, helandine kirine tîr, şûr û rim. Bi wan çekên hesinî, li ber artêşa nîzamî ya Asûran a nola xezeba xwedê rabûne.

***

Di dem û dewranên berê de, seydvanî hebû; seydvaniya mêş-hingivan. Ji bo vê seydê, pisporî, şarezayî diviya. Evan kesan diçûn ber avan; li wir mêşên hingiv ji ser delavan difirandin. Ew mêş, çaxa ji ser delavê avê difiriyan, çend caran li dora xwe doş dibûn, doş dibûn difiriyan. Seydvanî, fitlekên wan mêşan dijmartin, li gorî fitlekên li xwe badidan, menzîla dûrbûnê dihesiband. Paşê seydvanî diket dû mêşa hingiv; ev gelî yê min, ew çiya yê te...!

Em jî li sêryana gundê Sîrimê, nola mêşa hingiv li dor xwe doş dibin û ber bi menzîla xwe ve dikudînin.

Çaxa hûn ji Amedê derkevin û berê xwe bidin Ûr-faya qedîm, sêryanek we pêşwazî dike. Sêriyan, nola lefekê egala kalemêrekî qerejdaxî, lihevbadayî ye. Em ji makeriya Ûr-fayê vediqetin, nola mêşa hingiv a ji ser delavan difire, wanî li dora xwe doş dibin û tên di bin pirê re derbas dibin. Berê me li Xarpêtê ye; di ser Xapêtê re, em ê derbasî Pertegê bibin.

Di navbera Amed û Erxeniyê de, pireke dîrokî heye; jê re dibêjin pira Reş/Devegeçîdî. Yek û dudu em xwe digihînin vê pirê. Hew xwedê dizane û ev pir dizane, bê ka vê pirê şahidî ji cendekên çendik û çend qîz û lawên bavan re kiriye. Di salên nodî de, hêzên dewletê yên tarî, welatparêzên kurd miqîm dianîn li bin vê pirê û li dewrûbera wê şikenca kesnedîtî li wan dikirin. Paşê jî ew dikuştin û termên wan davêtin wan deran. Em riya xwe bi van bîranînên dilguvêşîner, digel stranên ji dem û dewranên berê hatine dawerivandin dikudînin.

Vê carê sewta qîzeke ciwan ji hoperlorê bilind dibe; sewteke ji wan sewtên meriv efsûn dike; sewteke ji wan sewtên guhdarên xwe, ji xwe re dîn û bengî dike û berdide çol û çiyayan: "Welatê me Kurdistan e/cî û meskenê me kurdan e/welat ji me ra rih û can e/kurd hemû biran e/..."

Wêneyê Aslîka Qadir a 16-17 salî, li ber çavê min zindî dibe; dev û lêvên lihevhatî, eniya keverî, birûyên kevanqeytanî... Nola bibêje, rojê tu hilneyê, va me ez li vir im.

Youtûbê, jixweber stranên ku berê me herî pir li wan guhdarî kiriye, li me dide guhdarîkirin. Dîsa Seîd Axayê Cizîrî dorê ji yên din distîne: "Ew milkê kurdaa'an!..." Tu yê sond bixwiyî ku gorbihuşto dizane em di geliyê Madena Xarpêtê de ne. Li rast û çepê me axeke di rengê paxirî de, bin tava havîna sorê soringî de diteyise. Ev çiya, gelî, newal, seraaaping mahdena hesin û paxir e. Bi hezaran sal in, benîademî miqîm paxir, hesin û tiştên dîtir ji vê axê derdixîne. Heke çem rûbar, derya oqyanûs bûna jî niha ji zû de miçiqî bûn lê çem jî derya jî heta oqyanûs jî bimiçiqe, ziwa bibe jî dawî li mahdenê, çiyayê Kurdistanê nayê.

**Keştiya Alalû**

Ne tenê benîademî, mexlûqatên ji alemeke din jî werin madena Kurdistanê bibin, ew ê têra wan jî bike.

Xwînerên ezîz. Navê vê rûpela min "Keştiya Alalû" ye. Li gorî kevalên kîl ên Sî-mêran/Someran ku ji peravên Dîjle û Ferêt derketine, di wan kevalan de dinivîse: Alalû, Mîrê gerstêrka bi navê Nîbîrû ye. Atmosfera gerstêrka Nîbîrû xerab dibe. Jiyan li wê derê diherime. Alalû, dike nake nikare çareseriyekê ji wê karesatê re bibîne. Loma jî di nav miletê Alalû de xirimşirim derdikeve, dibe berdîberdan. Textê wî yê Mîregiyê werdigere. Alalû yê min û ve, firtê firtê xwe ji nav lepên serhildêran xelas dike. Hema mîr Alalû bi leza bezê li keştiya xwe ya ezmanî siwar dibe, dibêje xirp direve. Ha li vira, ha li wira, ha li vira ha li wiraaa! Tir, tir, tir, têêê ji dûr ve çav li deqeke şikî-şîn a şîn-birik dikeve. Belê, ew morîka şîn-birik, dinyalika me bi xwe bû ye.

Mîrê revoke, mîr Alalû çend caran li dora dinyalikê ya xikîxalî doş dibe, heta cihê herî guncaw ji xwe re kişif dike. Belê. Ew der e, dera ku çemên Dîjle û Ferêt xwe lê digihînin hev. Mîrê revoke Alalû, keştiya xwe li wir datîne. Paşê ji keştiyê peya dibe, dadikeve devê çêm. Bi gopalê di destê xwe de, ava çemê Dîjle-Ferêt dipelîne. Bala xwe didê, derdor nola zeraya rojê diteyise. Ji nişkan ve qîrînî bi mîrê revoke, mîrê welatê Nîbîrûstanê, mîr Alalû dikeve. Belê. Ew mahdena dezîk dezîkî dibiriqe, ew zêrê som bixwe ye. Zêrê som, yekta dermanê tamîrata atmosfera welatê wî yê xerabûyî, welatê Nîbîrûyê bûye. Alalû radibe tavilkê kordînatê ji hevnijadên xwe re dişîne, yên li gerstêrka Nîbîrû ne.

Mîrê revoke mîr Alalû, xizmên wî yên ji gerstêrka Nîbîrû hatibûn, ji xwe re li ber devê çemê Dîjle-Ferêt bajarekî ava dikin. Navê bajarê xwe dikin Erîdû/Herîdûr. Li gorî Sî-mêrolog/Somerologê navdar, Samuel Noah kramer dibêje: ev navê Erîdû, di nav hemû zimanan de, li zimanê Kurdî tê û di zimanê kurdî de, peyva "herîdûr" li vî navî rûdinê.

Mantiq û wate, nola kevirê di kilsê de were rûniştandin, li cihê xwe rûdinê. Bêguman ev bajarê wan ê ji xwe re wekî bajarê ewil ava kirine, gelekî ji gerstêrka wan a dayikniştiman, Nîbîrû dûr e. Loma jî navê bajarê xwe yê yekemîn kiriye, Erîdû/Herî-dûr!

**Rêwîtiya bi keştiyê ber bi Pertegê ve**

Ji Xarpêtê heta Pertegê, em pêncî kîlometreyekî din jî rê dikudînin. Em li dû şopên pêşiyên xwe yên bi nav û nîşan in. Şopên eyan beyan ên li ser kelatên bilind, li ser asêgehan. Şopên nola hêlîna teyrê baz. Ew hêlînên teyrên baz, ew keleh û birc. Yekûna wan, bi du mebestan hatibûn avakirin:

**1-** Ji bo parastina eşîrên Hûrrî/Xûrrî-Mîtanî yên ji ber xezeba Asûrên barbar, Asûrên dirinde, Asûrên dilkevir reviyabûn û hatibûn di bin sîwana hukumdariya Xaltiyan de, li çiyayên asê xwe civandibûn ser hev.

**2-** Ji bo parastina lanên hesin ên dewlemend.

Riya reşayê ya erebeyan, li peravê bendava Kebanê diqede. Em jî tevî tomofîla xwe li keştiya şaredariya Pertegê siwar dibin. Piştî panzdeh xulekan, keştiya gewre sê caran nola dewareke kovî diore. Bi orîna keştiyê re, qaqlîbazên hewisandî, qir û qiyameta reş radikin. Nola zarokên xarî şekirên li ser serê bûka bixêlî reşandî bikin, wan qaqlîbazan jî wanî xwe xwujî kurtêlên simêtên ku rêwiyan davêt li ber wan, dikir. Qarewara wan a mahşerî, tev li orîna keştiyê û pêlên ava ji ber sînga keştiyê diqelişî dibû. Qerepere û heytehoyeke kesnedîtî li bin guhê hev diket. Ji vî aliyê bendavê heta wî alî, ewan qaqlîbazan nola berbûyên li dora bûka siwarkirî bireqisin, wanî li ser serê me çûn û hatin.

***

Ji bo meriv bikaribe biçe ser keleha Pertegê, divê meriv bi keştiyê biçe. Lewra piştî gewimandina ava bendava Kebanê, keleh li ser bilindahiya girikê tûjik, nola giravekê maye di nîvê bendavê de.

Em çavê xwe li keştiya ku ew ê serdêran bibe keleha Pertegê digerîne. Ti liv û lebatek li ber çavên me nakeve. Em ji esnafekî dipirsin, ka gelo ew ê keştiya diçe keleha Pertegê, çi çax rabe. Esnaf, keserekê di devê xwe yê bêdiran de diifîne. Bi çavê xwe yê spîkê avêtibû ser li dûr, li cihekî nediyar dinêre û dibêje: "Keştiya çi halê çi, birazî! Vê şewbê, malik li me viritand."

Dosta me ya bi navê Sewgî ya qîza dêrsimî, nola xocê xizir bi hewara me tê. Keştiya şaredariya Pertegê, nexasim li ser kîsê me saz dike. Em jî li wê keştiya xwe ya hinkase siwar dibin û ber bi keleha Pertegê ve bi rê dikevin.

Dîsa keştî nola dewareke kovî sê caran diore, dîsa qaqlîbazên me yên bêrû, bi raterqa me dikevin lê vê carê kurtêlên simîtan bi lepê wan nakevin da ku ji xwe re bi çilekî bipûrisînin. Nola çivir ji me re dijûnan bide, vê carê bi miqamekî dîtir, dikirin qarewar; qaqlîbazên gumre, em kirin xax û çûn.

Keştî li ber girava ku keleha Pertegê li ser hatiye çêkirin, lengerê berdide erdê. Çaxa ez bi berpala giravê ve radipelikim, wêneyên navçeya Pertegê, yên gelekî kevn li ser tabelayê tên dîtin. Hingê bîn û berata bendavê tune bûye. Avahiyên navçeyê, tevdek li derdora kelehê bûne. Hema bêje avahî tevdek, yên dîrokî ne lê çaxa di salên şêstî de dest bi avakirina bendavê dikin, dewleta tirk wan avahiyên dîrokî tevdekî dirûxîne.

Nivîskar Fîkret Yaşar di gotareke xwe de dibêje: "Çaxa bendava Kebanê tê çêkirin, hingê li derdora kela Pertegê, çend kevalên kîl derdikevin. Ew keval, ên şaristaniya Hûrriyan in. Hema hema bi kurdiya îroj em bi kar tînin, hatibû nivîsandin. Çaxa rayedar lê hay dibe ka ev çi keval in, tavilê wan kevalan dişikînin û davêjin lê di nav wan arkeologan de, arkeologekî holandî hebûye. Ew arkeologê holandî 2-3 heb ji wan kevalan ji arkeologên tirk vedidize û bi xwe re dibe Holandayê."

**Keleha Pertegê**

Ev keleha Pertegê, ji hêla hukumdariya Xaltiyan ve hatiye lêkirin. Tê texmînkirin ku keleh li derdora du hezar û 800 sal berê hatiye lêkirin. Di serdema Romayê de jî hinek beş lê hatine zêdekirin. Ji derdora Meletiyê bigire heta Xarpêt, Dêrsim, Çewlik, Mûş û heta Wanê, hemû kelehên di vê navberê de hatine lêkirin, bi mebesta parastina lanên hesin û xelkê herêmê bûne lê Xaltiyan, herî zîde girîngî daye lanên hesin. Lewra hesin ji bo wan, madeneke jiyanî bûye.

Çaxa Xaltî, hesin kişif dikin, şûr, mertal, bivir, tîrmen (serikê riman) û tîr-kevan ên ji hesin û pola çêdikin. Hingê di destê Asûrên neyarên wan ên xedar de, alavên cengê yên tûnc hebûne.

Tê zanîn peykerekî teyrekî hesinî yekî dêwasa li ser keleha Pertegê hebûye. Peykerê wî teyrî yê hesinî, ji hêla Xaltiyan ve li ser bilindahiya kelehê hatiye çikandin. Gerokê navdar Ewliya Çelebî jî û gelek gerokên serdema kevn jî dibêjin ku ew teyrê hesinî, heta beriya artêşa îslamê were vê herêmê jî li ser kelehê çikandî bûye lê çaxa Xalid Bîn Welîd tê vê herêmê, ew bi destê xwe peykerê wî teyrê hesinî, ji jor de tîne xwarê û tine dike.

Navê teyr, li ba pêşiyên kurdan Xaltiyan, Per-ta bûye. Bi îhtîmaleke mezin, navê Pertegê jî ji Per-taya Xaltiyan tê. Gava meriv wî teyrê hesinî yê ji hêla Xaltiyan ve li ser bilindahiya kelehê hatiye çikandî bigire ber çav û navê teyr, bi zimanê Xaltiyan ê Per-ta bîne bîra xwe, hingê şik jê re namîne wateyeke din a vî navî hebe. Jixwe peyva "per" em di kurdiya îroj de, wekî "bask" bi kar tînin. Ev peyva "per" peyveke ji wan peyvên herî kevn a zimanê kurdî ye. Ango, em bîst peyvên makekok ên zimanê kurdî bijmêrin, peyva "per" di nav wan bîst peyan de, yek ji wan peyvên makekok ên herî bingehîn e.

Di xeleka tê de, keştiya Alalû ew ê xwe li ser keleheke din a pêşiyên kurdan deyne. Li bendê bin!